



1992: Saleke reş û spî

Sala 1992'yan, li dijî hemû dijwariyan di têkoşîna neteweyî ya Kurdistanê de cihê girîng girt. Di vê salê de, têkoşîn ji hemû salên din tekûztir û xurttir bû. Di her warî de, pêşveçûn çêbûn û ref ji hev kîş bûn.

Newroz, artêşbûna gerîla, livbaziyan kontr-gerîla, valakirina gundan, 15'ê Tebaxê, pêşveçûna têkoşînê li bajaran, Şerê Başûr, xebatên çandî... muhasebeya salekê di rûpelê 8 û 9'an de...



Belgeyên
dîrokî

Rûpel 16



Îman
Botanî


Rûpel 13



Rewşa
mêrên
Kurd

Rûpel 6

REWŞ



Abdullah Keskin

Ji xwendevanan re daxuyanî

ROJNAMEYEKE NÛ

Berî du hejmaran (hejmara 43'yan) me di vê stûnê de nivîsîbû. Di salvegera Welat, meha Sibate de emê rûpelan zêde bikin. Berî guherînê jî em dixwazin dîtînen xwendevan û nivîskarên xwe bizanibin. Xwendevanên me dîtînen xwe ji me re dinivîsin. Armanca me ew e ku bi xwendevanên xwe re em Welat biguherin, nû bikin.

Ji xeynî vê di Sibate de emê hejmareke taybetî derxin. Bi taybetî emê li ser rojnamegeriya Kurdî bisekinin. Teklîf û dîtînen xwe ji me re bîşînin.

WEŞANÊN WELAT

Rewşa weşanxaneyan herkes dizane. Hê jî weşanxaneyê ku bi tîne kitêbên Kurdî diweşîne nîn e. Vî barî jî, em hildigirin ser milên xwe. Bi navê Welat emê ji vir û pê ve kitêbên Kurdî çap bikin. Kitêbên ku me amade kirine û niha li ber çapê ne ev in: İsmail Beşikçi: **Çend Gotin li ser Ronakbîrên Kurd, Gabar Çiyan,**

Mihemed Şêxo, Musa Anter: **Çinara Min, Navên Kurdî...** Hevalên me romana **Ezîzê Gerdenzêrî: Fincana Ferfûrî** ji alfabe Kirîlî werdigerînin alfabe Latîni. Şiirên **Luis Aragon** jî em ji Fransî de wergerînin Kurdî. Şiirên **Jan Dost** jî hazir in.

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Em ji xwendevanên xwe rica dikin, wexta ku tiştê girîng bişînin bila bi taahhud (taahhütü) bişînin. Wêne û kitêban bi vî awayî bişînin. Gelek caran nivîs û name nagihîjin destên me, gelek ji wan dereng dimînin. Gelek nivîs, ji vê sedemê dereng dimî-

Sala 1992'yan jî derbas bû. Muhasebeya vê salê hûnê di rûpelên me de bixwînin. Zehmetî û nexweşiyên 1992'yan hebûn lê, têkoşîna gelê me jî di vê salê de gelekî bilind bû. Em ji sala 93'yan hêvîdar kirin.

nin an jî dernakevin. Ji wê yekê jî car bi car nivîs û nameyên xwe taqîb bikin, bi telefonê li me bigerin.

REXNEYÊN YEKALÎ

Rûpelên Welat ji her mirovên ku hîssiyat û hassasiyeta xwe winda nekîrî re vekîrîne. Rexne û munaqêşe (munaqêşeya bi seviye û rexneyên

objektîf) dewlemendî ye, mirov bi pêş dixin. Çiqas li dijî me jî be, rûpelên me ji dîtînen cihê re amade ne.

TÎR'A APÊ MUSA

Nivîskar û xwendevanên Kurd pênûsa Apê Musa li erdê nahêlin. Di dema şehîdbûna wî de gelek nivîs ji me re hatin, hê jî tîr. Me qismek ji van çap kir. Niha jî em nivîsên wî yê ku çap nebûne diweşînin. Quncika Apê Musa wê demêke dirêj bimîne û nivîs û şîirên ku li ser hatine nivîsandin emê tev de çap bikin. Li ser Apê Musa, jiyana wî, nivîskarî û têkoşîna wî hûn çî bifikirin ji me re binivîsin. Piştî ku ev nivîs temam bûn emê wek kitêbê çap bikin.

BELAVKIRIN Û ABONE

Weke hûn tev dizanin ev 2 meh e, rojnameya me li gelek deveran belav nabe. Niha li gelek deverên Kurdistanê em bi îmkânên xwe belav dikin. Di vê dema teng de alîkariya xwendevanan girîngtir dibe. Di belavkirina rojnameya Welat de ji me re bibin alîkar. Bibin abone û li dora xwe aboneyan bibînin.

SALA NÛ

Sala 1992'yan jî derbas bû. Muhasebeya vê salê hûnê di rûpelên me de bixwînin. Zehmetî û nexweşiyên 1992'yan hebûn lê, têkoşîna gelê me jî di vê salê de gelekî bilind bû. Em ji sala 93'yan hêvîdar kirin.

Sala we ya nû pîroz be.

FERHENGOK

- Banger: Lox, pê xanî tê gerandin
 Bergene: Hember, raber
 Bergîdan: Berdêl, gerew
 Co: Cok, cih, erx, cuhi
 Conî: Hewd, tê de dan tê kutan (dibek)
 Çalak: Faal
 Çalaki: Faaliyet
 Çandhez: Kesê ku li ser kulturê dixebite, jê hez dikê
 Çeper: Çember, dorhêl
 Çil: Nefs
 Çilek: Nefsek
 Danişin: Ji bo dadgehê rawestin (duruşma)
 Durr: İnci, moriya giranbuha
 Ewle: Emin, itibar (güven)
 Ewleti: Emniyet, itibarî (güvenlik)
 Ewlekarî: Emniyet (güvenlik)
 Fikare: Jê tirsin, jê vekişin (çekinme)
 Gencine: Xezine
 Helk: Hilm, nefes (soluk)
 Helikandin: Hilmandin, hilm derxistin (solumak)
 Helikin: Hilm, nefes, hilm danustandin
 Hunerhez: Kesê bi hunerê dikêfire, li serê dixebite
 Kêfirandin: Hewldan, mijûlbûn (uğraşmak)
 Kêferat: Hewl, meşqale (uğraş)
 Mamiz: Ask, xezal, aska ji cîsan (Karaca)
 Nevî: Torin
 Neviçirk: Neviyê nevi, torinê torin
 Olan: Aks (yankı)
 Olandan: Aksdan (yankılanmak)
 Pan: Bendewarkirin
 Payin: Li tiştê bendewarkirin
 Paxav: Pê guhdarî nekirin (aldırmaşmak)
 Peti: Xwerû, safî
 Qerwaş: Qewraş, xizmetkara keç
 Qeyiqandin: Zorê dayîna hev (birbirini sıkıştırmak)
 Quncifandin: Xwe civandina ser hev (büzülmek)
 Ji sermayê xwe diquncifîne

Li ser zarê Kurdî

Ez di dibistana navîn de dixwînim. Ji ber ku em ji başûrê-rojhilat in, mamosteyê me, der heqê zarê Kurdî de, ji me axaftin xwest.

Em xwendekarên dibistana navîn, li ser vê babetê axivîn. Mamosteyê me, ji me re di polê (sınıf) de digot, "Zarê Kurdî ji zarê Farisî çêbûye." Ey hevalên rojnamevan! Mamosteyê min rast dibêje, an na? Ez di polê de, li pêşberî mamosteyê xweyderketim. Min got: "Zarê Kurdî, ji zarê Farisî nehateye. Hûn zarê Kurdî, lehçeyek tenê dibînin. Ev xelatiyê mezin e. Lewre zarê Kurdî şeş (6) lehçe ye." Min wiha domand: "Kurd, berê ne Tirk bûn, pişt re nebûn Kurd. Lewre serê hinek Tirkan, bi av û sabûna kemalîzmê hatiye şuştin. Zimanê Kurdî, ji 60.000 hezar bêjeyî zêdetir e. Kurd, ne Tirk bûn, ne Faris û ne Ereb bûn." Li ser van gotînan min, mamosteyê min, bi min re xeydî.

Ez û hevalên xwe yê xwendekar ji we dipirsin. Zarê Kurdî ji ku tê? Çend bêje ye? Çend lehçe ye? Kurd ji kîjan mîletan (gelan) tîr? Çanda Kurdî ya zarî di çi rewşî de ye? Ger yekî kemalîst ji me bipirse, zarê Kurdî ji çi zarî tîr, emê bersiveke çawa bidîne? Em û hevalên xwe, ji we rica dikin, bersivan van pirsan bidin. Hem ji bo me, hem jî, ji bo xwendekarên dibistanan û xwendevanên rojnameya Welat. Ezê car bi car ji we re nameyan binivîsin. Ger hûn bersiva vê pirsê me nedin, nebêjin ev xwendekar hew rojnameya me dixwînin. Hûn nenivîsinin jî emê bixwînin û li Welat xwedî derkevin.

Ez li ser navê xwe, pîrseke din jî,

ji we dipirsim. Hûn nexeyidin. Lewre min nivîsê piir dirêj kir. Adetên dawetên başûrê-rojhilat çi ne? Ger hûn karibin heta Nîsanê binivîsin, ezê kêfxweş bibim. Pîrs xelas nabin. Ez dixwazim ji we re hîn tiştên din jî bêjim. We heta niha 43 hejmar derxistîye. Lê kêmasiyên we piir mezin in. Ezê hinekan ji we re pêşkêş bikim:

1- Hûn der heqê ola (dîne) me de, tiştê nanivîsin.

2- Rojnameyên burjûwaziyê derewan dikin. TV û radyoyên wan jî derewan dikin. Hûn van derewên wan, baş dernaxin holê. Mînak TV dibêje: "Hevqas terorîst" yanî heval hatin girtin, wiha bû leşkerên Tirk wiha kirin." Tiştên ku Tirk dibêjin (Tirkên kemalîst) ez ji wan bawer nakim.

3- Rûpelên Welat piir hindik in. Lewre yê Tirkan, yê rojane 25 rûpel in. Hûn jî derxin hevqasî. Lewre di hefteyekê de, em du caran Welat ji nû ve dixwînin.

4- Hûn biratiya Kurd û Tirkan diparêzin. Heta niha ez leqayî tiştê wiha nebûme.

Yanî az dibêjim, ger hûn bêjin Kurd û Tirk bira ne û divê wek hev bin, hûn vê diparêzin. Ez jî vî diparêzim. Hûn jî rîya rast dernekevin. Heta qeweta min bigihîjê, ezê Welat bixwînim. Ger we heta vir nameya min xwendibe, neqêherin ku min piir nivîsiye. Lewra, ez piir bi derd bûm.

Ez gelek silavan li we dikim. Gelek spas.

Ji Batmanê xortekî welatparêz

Rexne yekalî ne

Hevalên delal;

Ez nikarim xeynî ji dil û can we pîroz bikim, ji ber ku piştî Hawara Mîr Celadet ya-mixabin-temen kurt, hûn ta niha cidîne û bi bawariya min rojnameyê piir başe li gor şertên Kurdistanê û gelê Kurd. Loma hûn li me pîroz bin û hêviya Welateke hêjatir û bê kem û kurî di rojên li pêş de.

Ji roja Welat ji dayik bûye, ez xwendevan û hevalê wê me. Min xwest ku ez tîkiliya xwe bi Welat re hildime sewiyeke bilindtir. Bi baweriya min gereke cih bêhtir bide rexneyên hinekî ji xeta Wela-

tî bingehî dîr. Weke xwendevanekî ku ji roja pêşî ve agahdarê pêşveçûna welat e, ez pê dihesim ku rexne di rojnameyê de, hinekî yekalî ye. Gelo sebêbê vê xwendevan in, an jî Sernivîsariya Welat e, ez nizanim lê hêvî dikim em di pêş de rojnameyê bêtir şamil bibînin.

Berdewambûn û pêşveçûna we garantiya rojên ronahîtir e, loma li ser ya xwe bin û dilê hemûya bi we re ye.

Di gel silavên dostaniyê, ji hemwelatiyê we

Goranê Haco

Li ser çandê bisekinin

Berî her tiştî em silavên dostani li we dikin. Berpirsiyarên heja; em çend welatperwerên ku Welat dixwînin, daxwazê me ji we heyê. Daxwaza me ew e ku, rojnameya Welat bi piirani li ser çanda Kurdî bisekinin. Li gor dîtinên me di rojnameya Gündem û Yeni Ülke de bi temami xeberên

rojane derdikevin û li ser diskinin. Ji ber vê yekê, em dixwazin ku Welat li ser çand û dîroka Kurdî bisekinin û bi piirani rapor-tajan bi ronakbîr, hunermend û hwd. re bike. Bi silavên germin. Spas.

Feremêz Zaxurani
 M. Elî Têrkî / France

Sala we ya nû pîroz be

Welat

Li ser meleyên medreseyan

Di dîroka Kurdî de gelek meleyên medreseyan rabûne û hinek ji van meleyên medreseyan di kultura neteweyî de gelek pêşve çûne. Mina Ehmedê Xanî, Meleyê Cizîrî, Cigerxwîn û hwd.

Îro jî meleyên ku di vê rîyê de dixebitin piir in. Em ji van meleyên ku ji bo Kurd û Kurdistanê dixebitin gelek hez dikin, Xwedê jî wan razî be.

Daxwazaya me ji we ew e ku hûn meleyên medreseyan tev di vê rîyê de bixebitin û bi gelê me yê nezan re bidin zanîn, rastiye. Ji ber ku neynika (eynika) gelan mirovên xwenda ne. Çawa ku dibêjin, "Alimek ji ber alemekê ve ye." Lê mixabin îro em dimyazînin meleyên me tev razane. Tu dibêji qey ketine tamara mirinê. Tiştê ku dizanin jî nabêjin.

Gelî meleyên medreseyan! Va ye cih ji we re nemaye. Hûn dibînin meleyên sexte ketine şûna we. Êdî minber jî nagihîje destê we. Li we maye ku hûn rûnên û binivîsin. Ji bo welatê xwe bixebitin.

Ger hûn xwe bi nivîsandinê nedine pêş, heta çend salên din êdî nema navê we jî dimîne. Ji ber vê yekê em dibêjin; mesekînin û bi nivîsandinê xwe bidine pêş.

Çiya Dûbî / Erûh

Pirşnameya mebûsê HEP'ê yê Sêrtê Zübeyir Aydar:

'Ibrahim Sevilgen di qereqolên şefaf de bi îşkencê kuştin'

Navenda Nûçeyan- Mebûsê HEP'ê (Partiya Keda Gel) Zübeyir Aydar pirşnameyekê der barê gundiyan Reşene û Basnê ku ji aliyê qereqola li gundê Reşene ve hatibûn binçav kirin de, ji bo bersivandina Wezîrê Karê Hundirîn İsmet Sezgin da serokê Meclîsa Tirk.

Gundiyan Reşene û Basnê ku girêdayî navçeyên Duhê (Eruh ya Sêrtê, di roja 19.9.1992' an de ji hêla qereqola Reşene ve tene binçavkirin Ibrahim Sevilgen (60), Abdurrahman Çelik (65), Resul Sabah (55) û Süleyman Ekinci ne. Ev gundî ji hêla qereqola Reşene ve tene girtin, li wan tahde, îşkence û heqaret tê kirin. Gundi bi roj di karê avakirina qereqolê ku ji aliyê gerilayên ARGK'ê ve hatibû rûxandin, tene xebitandin û bi şev ji di cihê bi talûke de nobet bi wan didine girtin.

Dîsa ji aliyê eynî qereqolê ve, di roja 9.12.1992' an de ji gundê Basnê Keya (muxtar) Mustafa Ekinci, Hacı Ekinci û Abdullah Ekinci tene binçavkirin û eynî tişt li wan jî tê kirin.

Piştî gelek hewldanê lêzîmên (eqrebayên) kesên binçavkirî mudaxele tê kirin lê, di 24-25.

12.1992' an de Ibrahim Sevilgen ji ber îşkenceya ku lê dibe dimire, hestiyê milê Keya Mustafa Ekinci yê rastê tê şikandin û yê din jî, ji ber îşkence, lédan û tahdayên ku qereqol li wan kiriye niha li nexweşxaneyê raketine.

Mebûsê HEP'ê yê bajarê Sêrtê Zübeyir Aydar di 30.12.1992' an de pirşnameyekê da serokê Meclîsa Tirk.

Ew pirşên ku dixwaze ji hêla Wezîrê Karê Hundirîn İsmet Sezgin ve were bersivandin ev in:


- Çima der barê binçavkirina van kesan de tu agahî nedane meqamên adli?

- Selahiyeta qereqolan a bi vî awayî heye? Ku tune be vî cesaretê ji ku distînin?

- Qereqol ev kesan li hember êrişên gerilayan mîna meral bi kar anîye. Li qereqolên din jî çespînen (tatbîqkirin, uygulama) bi vî rengî hene?

- Ev qereqolên ku dozger (sawci) jî, jê agahiyê nastînin dîke, vin kîjan refên "qereqolên şefaf", nêrina we ya li "qereqolên şefaf" ev e?

- Rewşa ku min di 16.12.1992' an de ji we re got, we got



Mebûsê Sêrtê Zübeyir Aydar

ku ezê tedbîran bistînim. We çî tedbîran standîye?


- Di heqê ew kesên ku vî çespîne pêk tînin tu tiştêk hatiye kirin, ku nehatibe kirin hûn dixwazin çî bikin?

- Hûnê tazmînatêkê bidin malbata Ibrahim Sevilgen, ku hatiye kuştin?

- Ew kesên ji ber vî pêkanîne mexdûr bûne, hûnê mexdûrbûna wan çawa telafî bikin?

- Ji bo ku ev çespîn dubare nebin hûn tu tedbîrêkê difikirin?

Yalçın Küçük hate girtin û berdand



Yalçın Küçük

Şewirmendê Giştî yê rojnameya Yeni Ülke Dr. Yalçın Küçük di 25'ê Kanûna 1992' an de seat di 9'ê serê sibê de ji hêla polîsan ve li Balıfırgeha Stenbolê hate binçavkirin.

Dr. Yalçın Küçük ji Şamê dihat. Bi Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan re li ser navê rojnameya Yeni Ülke û Özgür Gündem'ê hevpeyvînan kiri-

bû. Gelek dokuman, qaset, wêne û qasetên videoyê bi xwe re ji bo weşandinê anîbû.

Dr. Yalçın Küçük piştî 36 seatan hate berdand, lê belge, wêne, film û qasetên videoyê jî, ji hêla polîsan ve dest li ser hat danîn. Girtîbûna Dr. Yalçın Küçük rojnameya Hürriyetê, di manşeta xwe de da û got ku "Di nav PKK'ê de hesab dîtina bi hev re heye."

mut Bilur û ew kuştin.

30 Kanûn 1992: Esnafên navçeyên Hezexê ya bajarê Şirnexê ji bo protestokirina terora cerdevanên (cahşên) gundên Dara, Kefsûrî, Baslan û Soran kepengên xwe daxistin.

150 cahşên van gundan cerdî ser gundê Handûxê kiribûn û ji gund gundiyeck bi navê xwe Ibrahim kuştibûn. Esnafên Hezexê hem ji bo protestokirina kuştina Ibrahim û hem jî, ji bo kirinên hovanê ên cahşan protesto bikin, biryarê kepeng girtinê jî bo du rojan standin.

Li Batmanê li taxa Çamlıca'yê, molotof kokteyl avêtin dikanekê, du zarok birîndar bûn.

Di nava vî hefteyê de 100 kes ji navçeyên Hezex, Qoser û ji bajarên Ruha û Merçê hatin girtin.

Bûyerên hefteyê

Navenda Nûçeyan- **24 Kanûn 1992:** Li navçeyên Sirucê ya Ruhayê hêzên dewletê cerdî ser maleke ku gerîla tê de bûn, kirin. Di şerê navbera gerîla û hêzên dewletê de 3 leşker, 2 tîmên taybetî û 4 gerîla hatin kuştin.

Li nêzikî navçeyên Gungumê (Varto) ya Mûşê gerilayan ji erebeya ku polîsan dixwestin ew bisekinînin polîsan gullebaran kirin. Polîsekî kuştin û qomserekî jî birîndar kirin.

Li Nisêbinê li nêzikî gundê Bazarê kemîn danîn li pêşîya qonvoya leşkeran. Di şerê navbera gerîla û hêzên dewletê de gelek leşker hatin kuştin.

Li Nisêbinê hizb-î kontrayan welatparêzekî kuştin.

Li Batmanê li taxa Hürriyetê polîsên sivil welatparêz M. Şirin Özbek kuştin.

25 Kanûn 1992: Li Batmanê keyayê (muxtar) taxa İpergazê ji aliyê hizb-î kontrayan ve hate kuştin. Dîsa li taxa "Sağlık"ê welatparêz Tekin Sevim jî hêla hizb-î kontrayan ve hate kuştin.

26 Kanûn 1992: Li Amedê gerilayên bajêr li taxa Bağlar'ê erebeyekê polîsan gullebaran kirin. 5 polîs birîndar bûn.

28 Kanûn 1992: Li Amedê li taxa Melikahmed'ê gerilayên bajêr erebeyekê polîsan gullebaran kirin. 3 polîs birîndar kirin.

29 Kanûn 1992: Li Edenê li navçeyên Seyhanê gerilayan avêtin ser mala cerdevan Mah-

HAWAR

Dilbixwîn

Bi xatirê te Akademiya Mahsum Korkmaz!

Biborîne, bibexşîne; hinekî ev nivîs bi derengî ket. Lê bizanibe tu caran min tu ji bîra nekiriye. Li kêleka dilê min tu wekî guleke sor, şîn û geş mayî.

Te 10 salan em di hembêza xwe de hilgirtin, di van 10-12 salan de, te bêhtirî 10 hezar kes perwerde kir, çekdar kir... Te tiştên ku tenê di fenteziyê de dihatine dîtin afirandin (xuliqandin).

Li ser xaka te ya paqij û muqedes (bi rûmet) me dîroka welatê xwe ji nû ve nivîsand, me Kurdistanê windabûyî nas kir û dît. Me xwe, dinya, mirovahî dost, dijmin, sosya-

lîzm, împeryalîzm, mirin û jiyan nas kir, me serxwebûn û azadî, berxweda û qehremanî nas kir. Me tiştên ku nebihîstibûn bihîsitin, tiştên ku nedîtibûn dîtin.

Belê, me li ser sînga te hevaltî dît. Em hîn bûn hevaltî çî ye. Têkiliyên hevaltîyê çawa ne. Ji ber vî yekê de-

ma em ji hev cuda dibûn, me destên hev bi germayî diguvtin, me digot: "Serkevtin be, emê hev li welat bibînin..." Bi vî rihî heval ji hevalan diqetiyân.

Ji her çar parçeyên welat dihatin. Zaza, Soran û Kurmanc tevlihev dibûn. Me baş ji zîmanê hev jî fêm nedikir. Ew hatin ne ji bo tiştêkî erzan bû, ew hatin hatina serxwebûnê bû, hatina tolhildana ji bindestiyê bû, hatina azadiyê bû, ew hatin hatina şeref û namûsê bû.

Bila nivîskar binivîsinin, te çî kir û çî ne kir. Te çî got û çî ne got. Bila dîroka deh salan ku beramberî sedan salan e binivîsinin.

Di bin çadir û konên te de şivan bûne serok, bûne mamoste, bûne general. Bi serê xwe ev tenê dîrokeke.

Cih ne cihê me bû. War ne warê me bû. Em mêvan bûn, mêvantîya me 10 salan dirêj kir. Kî hat û kî çû, me çî dît û çî nedît. Ji egîdan bigire û heya tu digihîjî xayîn û xwefiroşan. Ji filozofan bigire û heya tu digihîjî gundiye Botanê.

Piştî 10 salan em bi şeref û rûmetdarî derketin me li pey xwe kevirên xwendegêha şehîd Hemze, teniya li ser dîwarê xwaringehê, me meydana sporê li pey xwe hişt. Me goristana şehîdan jî bi xwe re bire Kurdistanê, me bi dilê xwe re bir.

Bila kesek şaş fêm neke, em nerevîyan, weke egîdan em derketin. Dîsa tîfingên me li ser milê me bûn. Rextên me girêdayî bûn.

Em derketin, di çavên me de hêstirên hevîyê, di dilê me de hezkirin û bîranên hevalan hebûn. Berî em derkevin jî, me li pey xwe nihêrî, destê xwe hejand:

"Bi xatirê te Akademiya Mahsum Korkmaz û silav li we Akademiyên Kurdistanê!"

Kurdên Norwecê li qerara mehkemê îtiraz kirin:

Cezakirina Kurdan ji bo Tirkiyê xelata Noelê ye

Bi gotineke sivik rêvebirên Tirkan, hê ji hebûna Kurdan nas nekirine. Kurd hê wek kêmaniyekê (azınlık) jî nehatine nasandin. Zimanê Kurdî qedexe bû, herêmên Kurd hê jî bi awayeke sistematîk û bi darê zorê jî bo Tirkbûnê, tene asîmîlekirin. Rejîma Tirk, li dijî têkoşîna serxwebûna Kurdan PKK'ê, şerekî bi rêk û pêk dajo.

Norwec, Welat- Mehkemeya 31 Kurdên ku ji bo xirakirina balyoza Tirkan a li Osloyê hatibûn girtin, di 23.12.99'an de bi biryarekê ve xelas bû. Li gor biryarê, 26 Kurd bi 6 mehên bêsertî hatin cezakirin, du kes heta şeş mehan cezayê bi şertî 4000

kron pere girtin, yek jî, 90 roj cezayê bi şertî girt, ên din jî bêserûhatin dîtin.

Kurdên ku dema biryar hate girtin di dadgehê de bûn, ev ceza gelek giran dîtin û xwestin di cih de îtiraz bikin. Dozger jî aliyê xwe ve bi cezayê dilşad bû.

Dema biryar dihate xwendin, Kurdek gotin girt û got: "Ev biryar ji Tirkiyê re xelata Noelê ye".

Kurdan jî aliyê xwe ve sedema êrişê xwe şirove kirin û gotin: "Ev girêdayî ew tadahiyan ku dewleta Tirk li Kurdistanê dajo; ye. Êrişê li dijî balyozê, îsal di meha Adarê de pêk hatibû. Wê çaxê Kurd jî televîzyonê bûn xwedî agahdariyê ku, 24 hemwelatîyên wan jî aliyê polis û leşkerên Tirk ve hatibûn kuştin.

Mehkeme dixwaze li gor xwe bide nîşan ku, Norwec êdî aksiyonên wiha naxwaze. Zirara ku ketiye balyozê nêzîkî 900 hezarên Norwecê ye û ew

jî, ji aliyê yên ku hatine cezakirinê ve, çêbûye.

Mehkeme delil nedit ku ka kê êrişê amade kiriye. Lewma jî li ser vê biryardar e ku, ev êriş neplankirî ye.

Li ser vê rewşê Kurdekî wiha digot: "Em bi rastî du car ceza digirin; yek li Norwecê û yek jî li Tirkiyê. Ji bo me îro bi şûn ve, ziyaretkirina lêzimên (xismên) me yên li Tirkiyê gelekî zehmet e.

Ebûqata Kurdan Arne Haugstad, biryara dadgehê jî aliyê xwe ve gelekî giran dibîne û dixwaze Kurd îtirazî biryarê bikin.

Berpirsiyarê giştî ya rojnameya Norwecê Klassekanpen

di 28.12.92' an de, der barê cezayê Kurdan de nivîsarek nivîsandibû. Em vê nivîsê bi kurtî pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

"Bîst û şeş Kurd heta şeş mehan ji bo "êrişê" li ser balyoza Tirk bêsertî hatin cezakirin. Ji wan çend kes jî bêserûhatin dîtin. Çend kesan jî cezayên sivik girtin.

Mûameleya ku li Kurdan hate kirin, jî destpêkirinê ve çewt û şaş bû. Di nav wan de Kurd, di zemanekê dirêj de, di girtigehê de man. Ceza jî, jî ve ne dîr e. Di normalê xwe de, mirovên xort bi vî awayî nayên cezakirin.

Tiştê ku vî cezayê giran dîke, armanca cihê xerakirina balyoza Tirk e. Ji bo vê jî Kurd "cezayekê ekstra ya politîkî" girtin. Ji ber vê jî, ev cezayekî politîk e. Sedema xerakirina balyozê, raste rast ew bû ku, leşkerên Tirkan 26 Kurd kuştibûn. Ev jî di ew zordestî û talaniya ku di domanekê dîr û dirêj de, ji aliyê Tirkiyê ve li dijî Kurdan tê ajotin, zincîrekê ye.

Bi gotineke sivik rêvebirên Tirkan, hê ji hebûna Kurdan nas nekirine. Kurd hê wek kêmaniyekê (azınlık) jî nehatine nasandin. Zimanê Kurdî qedexe bû, herêmên Kurd hê jî bi awayeke sistematîk û bi darê zorê jî bo Tirkbûnê, tene asîmîlekirin. Rejîma Tirk, li dijî têkoşîna serxwebûna Kurdan PKK'ê, şerekî bi rêk û pêk dajo.

Divê, ceza jî li gor van rewş û hoyan bê nîrxandin. Li gor bawerîya me, divê rêvebirên Norwecê, jî bo avêtina dewleta Tirkiyê ya ji NATO bixebitin, heta ku rejîm şerê, ku li dijî xelkê xwe dajo, bide rawestandîna."

Xelata aştiyê

Gavan Koçer

Li Norwecê her sal di 19'ê mha Kanûnê de ji aliyê Komîteya Aştiyê ya Nobelê ve "Xelata Aştiyê" tê belavkirin. Îsal jî jînce Amerîka Başûrî, Rogiberta Menehu Tum, bû xwedî vê "şerefê".

Taybetiyên Menehu ev in: Ew jînceki ji Maya Îndîyanîyan (Çermesor) ku di warê matematîk û astrolojîyê de tene nasîn. Di esasiya xwe de jî Guetemalê ye, lê niha wek penaberek li Meksîkayê rûdine. Xebatên xwe yên politîkî û çandî li vir didomîne. Di xebatên xwe yên li dijî rejîma Guetemalê de, navgînên aştiyê bi kar tîne. Di şerê li dijî rejîmê de heta niha bi sed hezaran hemwelatîyên xwe wînda kirine. Di nav wan de, de û bavê wê jî hene û ew li ber çavên wê, jîndar bi awayekî hovane tene şewitandin. Ji ber ku bi tevahiya zemanê xwe daye xelasiya gelê xwe, nezewiciye.

Wek ku tê zanîn bi çuyîna Krîstof Colombûs a parzemîna Amerîkayê re, parzemîna (qita) jî aliyê Ewrûpiyan ve hat dagirkirin. Gelê ku ji berê ve li vir dijiya bi navê "şarezayê" bi awayeke bêmirovî hat qirkirin û çanda wan hate talankirin. Bi vî awayî jî dewlemendiyan parzemîna ketin destê Ewrûpiyan. Ji ber vê yekê ye ku îro li vir zimanê Îspanyolan bi ser ketiye û li seranserê qitayê belav bûye. Wek ku Menehu digot heta niha nêzî 150 milyon kes hatine kuştin. Ev jî tewandariya Ewrûpiyan e. Ji ber vê jî hînek dezgahên Ewrûpî di wîdanên xwe de xwe tewandar dibînin û nerchet dibînin. Ji ber ku bikaribin psikolojîyên xwe nerm bikin, xelatan belav dikin.



Rogiberta Menehu Tum

Lihevhatina çend faktoran Menehu kir xwedî vê "xelatê". Di nav van faktoran de;

-Koma Neteweyan (ku mirov baş dizane di bin kîjan dagirkiriyê de ye) sala 1993 kiribû sala "parastina çanda gelên bindest û bêhêz".

-Salvegeriya dagirkirina 500 salî ya Colombûs a parzemîna, hene.

Rogiberta Menehu Tum di pejiwandina xelatê de evana wiha tîne ziman: "Xelata aştiyê deynê

Ewrûpayê ye ku dane me. Ev jî bo wîdanê mirovahiyê bi xwe ve daxuyaniyek tîne ku ew tîkelî, yên ku em mahkûmiya dagirkiriyê û talankirinê kirine, karin bê gubertin. Ev li ser jîyan, mafdarî, aşti, dadî û biratiya di nav mirovan de bangîneki ye. Îro divê em ji bo dinyayekê rindtir, dinyayekê, bê feqîran û bê nijadperestiyê bixebitin. Li Rojhilata Navîn jî aştiyê tîbikoşin."

Em xebata Menehu xebateke pîr bi nîrxî û pîrralî dibînin. Em

bi tevahiyan dilê xwe bawer in ku Menehu di gotinên xwe de xerîbdost e. Ew li ser tiştên ku dîke û dixwaze bike, diaxive. Dilê wê bi keder û kulên hezar salan tîjî ye. Xem û xeyalên wê giran in. Bi vana dişewite û disoje. Berendambûna wê ya çandekê wêran-kirî, wê nêzîkê gelên bindest dîke. Jixwe ji bo wê şanaziyeke bilind e ku rewşa gelê xwe ya îroyîn û dirokî bi gelan bide naskirin. Li mêvanbûna wê ya li ba Samiyân jî nîşana ve yekê ye.

Lê, em bi ew kes û dezgahên ku van "xelatan" belav dikin, nabînin. Ji ber ku ew di kirinên xwe de ne cidî nînin. Ramanên wan teknîkî ne û ji dil nayên. Mirov bi awayekê vekirî xapandin û derewzînan wan dibîne. Her west qala aşti, wekhevî û mafdariyê dîkin, modelên demokrasîyê diafirînin. Lê tu cara kirinên NATO yê, zîlm û zordariyê dewletên ku dost dibînin, nabînin û naynin ser eynê xwe. Têkoşinên çekdarî yên gelên bindest nepak dibînin. Dewletên wan jî bo qirkirinê bindestan çekan difiroşe, dide xwînxaran, lê ew jî bo ku mirovên wan bêkar nemînin li dijî wan qirêjiyan dernakevin. Hê çend meh jî ve şûn ve balyoza Norwecê ya li Perûyê der barê Îndîyanîyan de pîr gotinên genî û nijadperest anîbû ziman. Wê çaxê tu dezgehekê "aşti û mirovîxwaz" li dijî ve derneketibû. Kurdistan wek mînakek di ber çavan de ye. Dewleta dagirker a Tirk dostê wan e herî mezin e. Êdî ne hewceyê pîr gotinan e ku mirov dirêj bike.

Wê çaxê em ve pîrsê ji we bîrsin:

Gelo kî dikare bawerîya xwe bi gotinên vala bine?

Heval Xelîl

Şehîdbûna te bawerîya me weke firêjê rojê dijwar û weke hingivê şana paqij, qewîn kir. Te jî kullîkeke sor di nav Kurdistanê de çand. Ji te re soz ku em ve kullîkê heya xelasiyê bi xwîna xwe av bidin. Şehîd nemir in.

Li ser navê şoreşger û welatparêzên ji **Universîta Marmara, Kampûsa Haydarpaşa Ekrem**



Mezelê Seîdê Nûrsî li Isparta ye

Bediuzzeman Seîdî Nûrsî di 23'yê Adara 1960'an de, wefat kiribû. Ji ber ku gelek însan dihatin serdana (ziyaret) wî, mezelê wî bi biryara Komîteya Yekîtiya Nete-weyî (Millî Birlik Komitesi) di Tirmeha 1960'an de hate guhertin. Kes nizanibû ku ew li kurê defin kiribûn. Lê di van çendê hanê de derket holê ku mezelê wî li Isparta ye. Ev jî bi saya hin şagirtên (telebe) wî diyar bû. Li gor gotinên şagirtan Seîdî Nûrsî wesiyyet kiriye ku, ji xeynî çend şagirtên wî, divê kes cihê mezelê wî nizanibe. Wan jî, ji ber vê wesiyyetê heta niha dengê xwe dernexistine.

Teqwîm jî berhev kirin

Rojnameya Yeni Ülke, ji nû ve hate berhevkirin. Rojnameya hefteyî Yeni Ülke, di van demên dawî de, bi hemû hejmarên xwe ve tê berhevkirin. Dadgeha Ewlekarîya Dewletê (DGM), sedemê berhevkirina Yeni Ülke, bi nivîsên wê yê rûpelên 1, 2, 3 û 5'an ve girê da. Di berhevkirina hejmarên berê de, sedemên berhevkirinê raste rast bi navdana nivîsan dihate diyarkirin. Lê di vê hejmara dawî de, nivîsên ku bûne sedemên berhevkirinê nayên gotin, rûpel bi temamî weke sedemên diyarkirin. Salname (teqwîm) ya ku Yeni Ülke jî bo sala 1993'yan amade kiribû jî, hate berhevkirin. Li gor Dadgeha Ewlekarîya Dewletê (DGM), sedemê berhevkirina Yeni Ülke, bi nivîsên wê yê rûpelên 1, 2, 3 û 5'an ve girê da. Di berhevkirina hejmarên berê de, sedemên berhevkirinê raste rast bi navdana nivîsan dihate diyarkirin. Lê di vê hejmara dawî de, nivîsên ku bûne sedemên berhevkirinê nayên gotin, rûpel bi temamî weke sedemên diyarkirin.

Endamên HEP'ê hatin mehkemekirin

'Ev dawê bi tesîra çapemeniyê vebû'

Navenda Nûçeyan- Daweya ku Serdozgeriya Dadgeha Ewlekarîya Dewletê (DGM) ya Enqerê, der barê rêvebirên Partiya Keda Gel (HEP) de vekiribû, di 25.12.1992'an de bi danişîna (duruşma) yekemîn dest pê kir.

Revêbirên Partiya Keda Gel, bi peyvîna xwe yên ku di Kom-civîna Awarte ya Duyemîn a Partiya Keda Gel ya di 29.9.1992'an de kiribûn, bi hinceta ku çalakîyên wan li dijî "yekîtî û tevahiya" dewletê bûye dawê hatibû vekirin. Danişîn bi xwendina îde-anameyê dest pê kir. Di îdeanameyê de, dema Komcivîna Awarte ya Duyemîn de, di celeniya Komara Tirk de axaftin hatine kirin û slogan hatine avêtin. Li gor îdeanameya Serdozgeriya Dadgeha Ewlekarîya Dewletê, ev sloganê han hatine avêtin: "Biji PKK, Biji Serok Apo, Vur PKK vur, Kürdistanî kur, Kahrolsun Faşistler û hwd." U rêvebirên PKG'ê mudaxleyî slogan avêtinê nekirin.

Piştî xwendina îdeanameya Serdozgeriya Dadgeha Ewlekarîya Dewletê ya Enqerê, cara pêşîn Cigirê Sekreterê Giştî yê Partiya Keda Gel Kemal Okutan, dest bi parêziya xwe kir. Kemal Okutan, parêziya xwe ya 25 rûpelî bi nivîskî xwend. Kemal Okutan di parêziya xwe de li ser peyvên

Kurd, Kurdistan, bi awayekî di-rokî rawestiya û îdeanameya ku der barê wan de hatiye amadekirin bi van gotinên xwe red kir: "Ev daweya ku der barê me de hatiye vekirin bi direktîfên hêzên serdest û bi pêşengîya çapemeniya burjûwa ya bi boyax hatiye amadekirin. Ev dawê, bi awirê Serdozger Nusrat Demiral û bi pêşniyara Serokwezîr Süleyman Demirel vebûye û ev dawê ne hiqûqî ye, siyasî ye."

Piştî parêziya Kemal Okutan, Harun Çakmak parêziya xwe bi devkî kir. Harun Çakmak jî mîna Kemal Okutan li ser amadekirina îdeanameya Serdozgeriya Dadgeha Ewlekarîya Dewletê rawestiya û daweya ku der barê wan de hatiye vekirin û ew qanûnê ku pê tene darizandin red kir.

Endamê Meclîsa Partiya Keda Gel A.Cabbar Gezici, bi taybetî li ser qanûnê 125. rawestiya, ew qanûnê ku pê tene darizandin bi awayekî hiqûqî rê û zê kir. A.Cabbar Gezici, ji ber ku di îde-anameyê de hebû û pê dihatin tewanbarkirin, li ser rengên kesk, sor, zer û ser ala PKK'ê jî rawestiya. Ferqa di navbera wan de di-yarî dadgeran kir.

Ji ber danişîna 15 endamên rêveberîya Partiya Keda Gel ne-qediya, danişîna duyemîn avêtin 26.1.1993'an. Bi xwestina ni-



Kemal Okutan û Harun Çakmak tahliye bûn. Mehkeme qerera berdewamiya girfîbûna A.Cabbar Gezici da.

wenêrên ebûqatan, Şanal Saruhan û Murat Bozdağ, Serokê Dadgehê Muamer Ünsoy biryara tahliya Kemal Okutan û Harun Çakmak û biryara berdewamiya girfîbûna A.Cabbar Gezici da.

En ku li danişînê bégirtibûn hatin darizandin ji ev bûn: Serokê Giştî yê Kewin Feridun Yazar, Serokê Bajarê Stenbolê Felemez Başboğa, Serokê Bajarê Antalya Güven Özata, Serokê Navçeya Çankayayê Mustafa Demir, Serokê Hekarî Hemit Geylani, Serokê Bajarê Wanê Şahabettin Özarlaner, Delege Mustafa Kemal Öztürk, Serokê Bajarê Sêrtê

M.Şakir Alay û ji endamê Komara Çiya Mehmet Gemsiz. Rewşa girfîbûna giyabi ya Serokê Bajarê Amedê Hüseyin Turhallı û endamê Meclîsa Partiyê Y.Serhat Buca jî, berdewam dike.

Gelek temaşevan ji beşdarî danişîna PKG'ê bûn. Di nava temaşevanan de hebûnê PKG Mahmut Kılınç, Emin Sever, Remzi Kartal, Leyla Zana, Hatip Dicle, Ali Yiğit, Sedat Yurtdaş, Mehmet Sincar, Selim Sadak, Sırrı Sakık û Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (IHD) Akin Birdal û ji Alîkarên Serok, Yavuz Binbay û Ercan Kanar hebûn.

Çeper li Tirkîyê teng dibe



Süleyman Demirel

Serokwezîrê Tirkîyê Süleyman Demirel, di civîna TÜGİAD'ê (Komeleya Karsazên Ciwan ên Tirkîyê) de peyvî û da xwuyan ku dê gelş û pirsgirêka kurdî ne bi "Azîneya Kuyucu Murat Paşa" lê di nav "çarçoveya demokrasiyê" de çareser bibê.

Serokwezîr Süleyman Demirel di civîna TÜGİAD bi navê "Hêvîkirina ji sala 1993'yan û li gorî hêvîkirinê pêşniyar" bersivê pirsên Karsazên Tirk ên ciwan da. Civîn di 29.12.1992'an de li bajarê Stenbolê çebû.

Endamê TÜGİAD'ê (Komeleya Karsazên Ciwan ên Tirkîyê) pirseke wiha jî Serokwezîr Demirel kir: "Demeke berê ez çûm bajarekî Çînê. Tu kes Tirkîyê û Tirkan nas nedikir. Yekî Çînî nêzikahî di min da û got: 'Hûn Kurdan qetîl dikin.' Hûn danasîna Tirkîyê çawa dinirxînin." Demirel jî, li ser vê pirsê gelek axîf ku "Ne hewce ye em herin Çînê ji xwe ne mumkun e

kuştin û di vê rê de 650 hêzên ewletiyê kuştin. Em vê meseleyê bi azîneyên (metodên) Kuyucu Murat Paşa naxwazîn hal bikin, em nakin jî. Tim di nav çarçoveya demokrasiyê de çare jî vê gelleşeyê rê hatiye gerîn. Tirkîyê hinek din jî hedan (sebr) bike dê hêza demokrasiyê bibine."

Serokwezîr Demirel li xwe mukûr tê ku, serhildanên Kurdan tim bi awayekê hovanê hatine rakirin û wê Kurdistanê de kurdên Kurd çandî.

aya Güven Özata, Serokê Navçeya Çankayayê Mustafa Demir, Serokê Hekarî Hemit Geylani, Serokê Bajarê Wanê Şahabettin Özarlaner, Delege Mustafa Kemal Öztürk, Serokê Bajarê Sêrtê Ercan Kanar hebûn.

MHP tevî MÇP'ê bû

Bi derbeya 12'ê Ilonê re, temamî partiyên siyasî ku hatin girtin, bi hemû kadroyên xwe ve jî qada siyasê vekişyan. Pê re jî, ji bo ev partiyên siyasî careke din nikaribin vebîn, qanûnekî derxistin. Li gorî beyanên rêveberîya leşkerî de piştî 1983'yan, rêveberîya dewletê dewrî sivîlan bikirana. Di vê navê de ji bo avakirina partiyên siyasî yê nû jî, izin dan. Lê belê bi şertê ev partiyên ku nû dê ava bibin bi tu awayî ne dewama partiyên siyasî yê nû ku berî 80'yan hatin girtin bin û navên wan jî bi kar neynin. Lê ji xeynî ANAP'ê partiyên siyasî yê nû, her yekê bi navekî nû, lê bi program û kadroyên xwe ve tev dewama partiyên ku berî 80'yan hatibûn girtin, ava bûn. Mesela DYP dewama AP'ê, SHP ya CHP'ê û MÇP jî ya MHP'ê bûn.

Hikûmeta koalîsyonê ya niha bi guherînên di "Oağıné"



Alparslan Türkeş

MHP ji nû ve, vebûn. Ji van hersê partiyên CHP tenê, wek xwe ma û tevî SHP'ê nebû. Lê berî demekê AP tevî DYP'ê û vêga jî MHP biryara stand ku bi MÇP'ê re bibe yek.

Di dawîya kongreyê MHP'ê de (27 Kanûn 1992) li gor daxwaza Serokê MÇP'ê Alparslan Türkeş, MHP xwe fêsix kir û tevî MÇP'ê bû. Her çiqas di nav alîgirên berdewamiya MHP'ê û kesên ku vek-

te. De tim meseleya Kürdî be setê. Di encama vê rekupera rîna ve qanûnî de AP, CH

Rewşa mêrên Kurd li Ewrûpa

Ger Kurd li Ewrûpa azad bibin ger Kurdistan li Ewrûpa ava bibe; xuya dibe ku kes naxwaze azad bibe. Lewre azadî li ser qada welat dibe. Cihê têkoşînê li wir e, têkoşîna rasteqîn, li ber siya porzer û çavhêşînên Ewrûpiyan nayê dayîn.

Bêrîvana Dêrsimî

Rewşa Kurdên ku ji welatên Ewrûpa mafê starbûne dixwazin, trajediyekê dihêne ziman. Kurdên ku ji leşker û polisên welatên dagirker ditirsin, zar û zêçên xwe, welatê xwe dîtîkînin û bi çîrokên komîk û bi sedemên ne politîk dikevin girava biyanîtiyê, demên xwe yên dawî dijîn. Lê ez mirovên ku li vir bi rastî têkoşîna siyasî, didin, ji îşkenceyan derbas dibin, bawerîya xwe ya bi şoreşê winda nakin, di nav gelek astengîyan de, fedekariyên girîng dikin û cangoriyên welatê xwe ne, ji vî awayî wan dût digirim. Lewre hedefên vê nivîsê ne ew in, gotina min ji wan kesên ku kesaniya xwe winda kirine re ye. Di vê dema şerê germ de, ku gelê me li welat, hem di warê leşkerî, hem ji di warê demokratîk de, bi canê xwe, xwe didine

pêş, em çavekî li jiyana zîlamên Kurd, ên li Ewrûpa penaberên siyasî ne bigerin.

Tu ji kî bipirsî, Kurdistanê di nêzik de ava dike, tu karî li hêviya têkoşeran nahêlin. Lê di rastiya xwe de, hemû ji mirovên tirsonek û revokên ji welatê xwe ne. Hinek ji wan ji bo kar, hinek ji, ji bo jiyana li vir yê dejenere tî. Ev kes, li ber hemû pest û tirsandinan serîwandi ne û kesayetiyeke wan nîn e. Ger armanc bîdestxistina kesaniyê be, ev li qada şer, li welat dibe. Di ber siya porzerên Ewrûpî de jiyandin, piştevegerîna rastiyan welat e. Zîlamên me, ji ber ku di dema hatina xwe de, baş nefikirîne, pîrekên xwe ji bi xwe re anîne. Lê dema çav li porzeran ketin, pîrekên xwe ji bîr kirin. Û hem ji dêrê hem ji mizgeftê bûn.

Divê, gelê me yê li welat

bizanibe ku, penaberên berê xwe didin Ewrûpa, ji şerê germ direvin. Yê ku li welatê xwe ji şerê jiyaneke azad direvin, têne wan warên ku kesaniya mirov bi pêş nakeve.

Ew ên ku zarokên wan asimîle dibin, ên ku di nav pîreka xwe û porzerên Ewrûpî de, dikevin dudiliyê, ên ku ji dema hatina xwe ve, li xwe digerin û nabînin, ên ji

sibê heta êvarê bi gotinên vala xwe têr dikin û di warê ramyarî de birçî dimînin, ên di jiyana xwe ya taybetî de, pîsitiyên bi her awayî dikin, lê di civînan de sloganên herî tûj davêjin, ên di malên xwe de, wîskiyê herî zêde vedixwin, an jî, ger xwedî dikanan bin û ji bo muşterî bikşînin li ser tabelayên xwe 'Kurdistan' dinivîsin, lê qaxoxên mezin davêjin muşte-

riyên Kurd; bila bê zanîn ku sibehê Kurdistanek ava bibe jî, ev mirovên han vengarin welat.

Ger Kurd li Ewrûpa azad bibin ger Kurdistan li Ewrûpa ava bibe; xuya dibe ku kes naxwaze azad bibe. Lewre azadî li ser qada welat dibe. Cihê têkoşînê li wir e, têkoşîna rasteqîn, li ber siya porzer û çavhêşînên Ewrûpiyan nayê dayîn.



Ger armanc penaberîyê bî destxistina kesayîyê be, ew li qada şer e. Li welat e.

Navên deveran bi Kurdî: Hakkari (Çolemêrg)

Hakkari Çolemêrg	(Merkez) (Navend)	Yeşilbulak Musahan Çanaklı Beşikli Tohumlu Alantoz Şenocak Çaltıkuru Banıklı İlk Y.Köy Akbulut Koçlu Akar Çaylıca Gürbüzler Dağsu Karaman Cevzidibi Sehberan Demirtaş Örencik Kuşlu Oluklu Yağmurlu Doğanıyurt Boğazlı Bağlar Yeniyol Akdikên Akçalı	Kanikez Musahan Baz Koçık Tovi Alantos Şavita Sevin Rezan İlkê Gunjurk Guranis İspir Babanis Akar Beri Adaman Sadinan Karaman Betkar Misczer Evranis Harabe Ceviz Eremyan Hisane Gorkaya Xaraberezan Biriman Reşanktû Gezne	Eğerci Kanath Yenihan Durankaya Güvenir Başlık Elmacık Köyceğiz Ceylanlı Yiğimli Gelinli Kamışli Geçimli Sütçüler Doğanlı Seyitli Işık Çetintaş Yapraklı Tepecik Geçitli Çengel Işıklar Soğucak Küçükköşk Çavuşlu Gelincik Yumrukaya Kaymaklı Sütüce Kavaklı	Palanis Reşank Yenihan Belan Hacelyan Sergeli Nispas Gundik Hidyane Dihê Mebük Elkek Runtuk Sirtê Davuş Kelitani Nişê Hergil Verkanis Dêr (Kilise) Guvik Piyanis Avetras Pirkanis Feqibalyan Qesr Erdanis Hepatik Singusir Şimuniş Evkanis Marunis	Çaltepe Mezra Armutlu Çeltik Kaval Esenler Dağ Söğütlü Kasir Lazlık Pınarca Çaylıca Taşlıca Çatdere Sarıköy Ayrınlı Hendek Işikli Yeniyol Ornak Aydın Oğul Göze Dilek Yayık Ağaçsız Kavak Yeşiltaş İlca Y. Otluca Otlubel	Kutüs Mezra Hare Kehî Kaval Begir Tax Çalebi Kasir Güzük Balakan Tanzürê Gewrik A.Zeranis Y.Zeranis Kemûtê Hendek Malkosan Navgozan Koçanis Surinis Turkünüs Tal Bakê Azizan Meşhûne Bêdar Rebet Talana Bekük Hananis Ameran	Düzce Köprücük Uyanık Sarıkaya Değirmenli Güzelköy Tümsük Y.Otluca Ördekli Tepeli Yuvacık Doğanca Şubası Meşeli Karıkdağ Dikmen Kirbaş Sulak Yüce Gümüşlü Su Derecik Umumlu Derebaş Üzümcü Dereli Dağaltı Çimenli Dereköy Yoncalı	Yekmal Mezra (Bekurupe) Hurûzan Guvasadê Çemî Halilan Sürman Y.Hananis Kutranis Hardelanis Pihink Orit Harûs Hecac Gelezû Matê Kirêserî Susê Akoz Kursin Dêz Şemaşê Mendan Sergeli Dizê Çemkan Mezirgû Çem Geli Anitos
------------------	-------------------	--	---	--	--	---	--	---	--

Berhevkirin: Halit Talçın Çolemêrg



Kirinek ji hezar gotinê çêtir e!

Gotinek Pêşyan

Mamê Silê ya star



Weke tê zanîn Süleyman Demirel politikvanekî Tirk ê kevn e. Di salên 70 û 80'î de du car li pey hevûdu dema ew serokwezîr bûn, leşkeran bi derbe wî ji serokwezîrtiyê dûr xistin. Niha ev cara heftan e, ku dibê serokwezîrê Tirkîyê. Di nav politikvanên Tirk de, kesî ku bi qasî Süleyman Demirel demagojî bike tune. S. Demirel bi ziman û psikolojîya xelkê baş dizane. Dema pirs ne li gor kêfa wî be, wê demê dest bi demagojîyê dike, ku kes tiştekî fêhm neke. Bi rastî, Süleyman Demirel di hêla politikaya kevneperest û nijadperest de, li Tirkîyê hunermendê demagojî, derew û xapandinê ye. Ez dixwazim li jêr ji wan axaftinên wî yê demogojîk çend minakan bidim. Ji van minakan hinek ji yê kevn in û hinek jî, ji dema serokwezîriya wî ya niha ne.

Jixwe di nav me Kurdan de, navê Şîlo sembola pêkenîn, qerf û kêmhîşiyê ye. Di vî warî de gelek lihevhatiyên zarokan hene. Wek :

Ya yekê:
Mamê Silê ya star.
Elba genim bîst û çar
Nanê garis naçe xwar
Min digo kerê bernede...

Ya didoyan :
Silo Silo du nikilo
Silo çû mala...

"DO DO BÛ ÎRO ÎRO YE"

Berî 1970'î Süleyman Demirel di muxalefê de bû. Wê demê soz dida xelkê ku dema ew were ser hukim, dê gelek tiştên baş bike. Paşê partiya wî bû iktidar û ew jî bû serokwezîr. Rojê rojnamevan jê pirsin.

Serokwezîrê birêz, tê bira te dema ku tu di muxalefê de bûy te çî soz dabû? Ka dê te wan bi cih bianiya?

Demirel, bi awayekî hêrs bersiv wan wiha dida.

Do do bû, iro iro ye!

HORA HORA YE

Di dema serokwezîriya kevin a Süleyman Demirel de, Tirkîyê xwest, ku li deryaya Egeyê bi keştiyan (gemiyan) li petrolê bigere û bikolê. Navê keştiya petrolê ya lêkolîna Tirkîyê Hora bû. Keştî ne ya Tirkîyê bû, lê Tirkîyê jî bo ditin û lêkolîna petrolê wî kiri bû. Dema Hora xwe amade kir, ku li deryaya Egê li petrolê bigere, Yewnanîstanê xwe jî şer re amade kir û got ku "Hora nikare li deryaya Egeyê li petrolê bigere, Ege deryaya me ye. Heger Hora ji cihê xwe derekeve em dê bi balafirên bombe bikin...." "Di serî de Demirel digot kes nikare Hora û xebeta wî bide sekinandin Lê dema dît ku heger Hora derkevê Egeyê, bi rastî şer di navbera Tirkîyê û Yewnanîstanê de derdikeve, Amerika û dewletên Rojava jî dê alikariya Yewnanîstanê bikin an heq bidin wê. Demirel Horayê jî benderê dernexiste der. Rojnamevanan di sa ji Demirel pirsin.



- Serokê birêz gelo rewşa Horayê çî û ew li kû ye?
Demirel bi hêrs û bi hevokê gelek kurt wiha bersiv dida.
- Çî bûye bi Horayê yanî? Hora Hora ye û ew di avê de ye!

HEŞA SUMA HEŞA MA MIN ZIVISTANÊ ANÎ?

Demirel serokwezîr bû, dem zivistan bû. Sar û serma lê kêmasiya mazot, benzîn û fuel-oil hebû. Demirel ji civîna wezîran derdiket; jî ba dergê rojnamevanan mikrofônê xwe dirêjî wî dikirin û dipirsin.

- Serokwezîrê birêz. Wek ku tu dizanî zivistan hat benzîn, mazot....

Demirel gotinê di devê rojnamevan de nivco hişt û nehişt, ku ew pirs xwe tamam bike, jî ber ku dizanibû dê çî beje û ew bixe tengasiyê. Bi awayekî tûj jî rojnamevan re got:

- Çî zivistan hat? Zivistan bi emrê Xwedê tê. Heşa suma heşa,

ma min zivistan anî, he?

Rojnamevan bi pey ketin, lê ew nese kinî û bersiv jî neda.

ZIVISTANAN EM DÊ JI WAN BISTÎNIN Û HAVÎNAN JÎ DÊ EW BIDIN ME

Di dema serokwezîrtiya Demirel a kevin de, hewcedariya Tirkîyê ji enerjîya elektrîkê re hebû. Hikûmeta Demirel a wê demê, jî bo standina enerjîyê bi Bulgarîstanê re peymanek çêkir. Li ser wê peymanê rojnamevanan pirsêke wiha ji Demirel kirin:

- Serokwezîrê birêz, wek ku tê zanîn hikûmeta we ji Bulgarîstanê enerjî distîne. Ma jî bo Tirkîyê ne şerm e ku ji çiraneke wek Bulgarîstanê yê biçûk enerjîya elektrîkê bistîne? Ma hûn dê çawa vî deynî bidin?

Demirel bi qurêtî:

- Vê meseleyê wiha mezin nekin. Zivistanan em dê ji Bulgarîstanê enerjî bistînin û havînan jî dê ew bidin me.

Rojnamevanên Tirk bi awayekî din meseleyê fêhm kiribûn. Ber êvarê fam kirin, ku herdu jî eynî tişt e.

MUMKUN Û XEYRÎ MUMKUN

Berî 1970'î Demirel soz dida ku dema partiya wî qezenc bike û ew bêye ser hukim, dê buhayê tiştan kêmbike. Di hilbijartinê de Demirel qezenc kir û ew bû serokwezîr. Di sa rojnamevanan jê pirsin.

- Ka te digot, ku 'ez bibim serokwezîr dê erzani çêbikim?'

- Ne mumkun e, ku xeyrî mumkun bibe mumkun û mumkun jî bibe xeyrî mumkun.

Rojnamevan li hevûdu mêze kirin û ji Demirel pirsin.

- Me fêhm nekir?

Demirel meşiya û jî wan re got.
- Min gotina xwe bi awayekî vekirî got, jî wê re şirove ne hewce ye.

Amadekar: Amed Tigris
Wê bidome



TÎR

Musa Anter



Lolo

Di bêjin zilamek hebû gelekî deyndar bû. Her êvar neh deh zilam diçûn perê xwe jê dixwestin. Lê tunebû ku bide wan. Nivdêhnî bûbû. Rojê derdê xwe ji hevalekî xwe re dibêje. Hevalê wî dibêje: Lawo xwe li dêhnî deyne. Hema heçê ku hat deynê xwe jî te xwestin zimanê xwe derxe û jî wan re bê lolo lolo. Bê henek mêrik wiha dike. Xwedî pere jî hev re dibêjin lawo, rebeno dêhn bû. De ka em hebekî bêhnê lê fireh bikin. Kes nema bi ser dikeve. Bêhna wî fireh dibe. De îca pereyê ku şîret lêkirine jî li cem in. Dibê birako de ka îca hema ê min bide min. Mêrik zimanê xwe derdixê û jî wî re dibê lolo lolo. Heval dibêjerê lawo jî xelkê re lolo ma jî min re jî lolo.

Îca ez nizamim kê şîret li Tirkan kiriye. Ji berê de ku em doza xwe dikin dibêjin yabo ma hûn bi tenê, li Tirkîyê ne?

Laz hene, Çerkes hene, İngûş hene, Azerî hene, Ahiskali hene, Ermenî hene. Rûm hene. Musevî hene. Abaza hene. Gürcü hene. Erebb hene, Türkmen hene, Kirgiz hene, Kazak hene, Turkistanî hene, Çeçen hene, Tirk, Kurd hene. De ji xwe Tirk jî daxilê ewên ku digotin hemû kers û merşên mihacir in. Me digot lawo di hidûdê Tirkîya îro de ji Kurdan pê ve kesî akincî (binecih) tune ne. Em tenê di welatê xwe de rûniştine. Meqseda wan ku me jî bikin wek xwe û me jî di nav xwe de winda bikin.

Hecî Kuto? Pîrekan jî dibêjin. Du pîrekên yax digirin û cardin dibêjin yadê dinya jî kesî re namîne. Ka Fatma Nebî an ka Mencika Kuto, ka Eysayê û ka Wet-ha?

Îca ev wek hev in. De îca Hecî Kuto li ku û Eliyê Şêr li ku? Û yan jî Fatma Nebîyan li ku û Mencika Kuto li ku?

Îşte li me jî wah dikirin em bîst milyon Kurd dikirin wek bîst sih hezar kesên mihacir ku gelek ji wan nizanin bi zimanê xwe xeber bidin heta nizanin ji ku ne. Gelek caran min ji wan pirsîye, ez dibêjim hûn ji ku ne, dibêjin em ji Stenbolê ne. Erê hûn ji ku hatine Stenbolê? Dibêjin kalikê me hatiye. Ez dibêjim navê kalikê we çî ye? Dibêjin wih wileh ez nizamim. De îca yabo bû çî ku Tirk me û van dikin yek. Di Kurdan de mal in hene, heta heft bavên tîn gotin. Mesela Mihemedê Şerîfê, silê Birê Hecî. Ev navê xortekî Kurdan e û bi heft bavên xwe tê naskirin.

Çîroka me û Tirkan ev e, inşelleh wê qenc derkeve. Pîrsek Almanan heye dibêjin ku taliya tiştêkî qenc be hemû qenc e. Ez dinêrim taliya milletê Kurd qenc bûye.

1992: Saleke reş û spî!..



Newroza 1992'yan bi serhildanên girseyî hate pirozkirin.

Navenda Nûçeyan- Sala 1992'yan, di dîroka têkoşina neteweyî ya Kurd de, cihê xwe yê erênî û neyîniyên xwe ve, girt. Di vê salê de, têkoşin tevî yê kêmîyê û xeletiyên, ji he-nû salan tundtir û xurttir bû. Salê Kurd germiya têkoşinê ya, bi awayekî girseyî tevî êkoşinê bû, xwe da pêş, mi-isên xwe ava kir, êrîş kir, hate kuştin, koçber bû, lê pişya, vek hesinê ku bibe pola, ew ji yê agirê têkoşinê hêz û bawerî-ya xwe xurttir kir.

Gerîla jî, xebatên artêşbûna xwe, bi serfirazî meşand, di vê iyê de gavên girîng avêt, êrîşên xwe, kontrola xwe ya li welat, parastina xwe li gor nercên artêşbûnê pêk anî. Ca-ya yekêmin bi sedan gerîla, erdî ser qereqol û avahiyên eşkerî kirin, hilweşandin, li navçe û bajarên êrîşên mezîn û jîngîng pêk anin.

Di warê çandî de, gelek pêşveçûn çêbûn. Kovar û roj-nameyên Kurdî ketin nav jiyana çapemeniyê, pirtûkên Kurdî derketin, enstîtu ava bû, Navenda Çanda Mezopotamî-a, bi gelek berhemên xwe nav dengê çanda Kurdî belav kir.

Lê, bê şik û guman, pêşve-çûna herî mezîn, avakirina Meclîsa Neteweyî bû.

Ev hemû, bê guman spiyên ala 1992'yan bûn. Belê reşên ê salê jî, li gor spiyên wê dij-yar bûn. Dewlet jî bo bikaribe-ê li ber van pêşveçûnan bigi-ze, li hember gelê Kurd êrîşên ijwar û hovane pêk anî. Bi se-an gund valakirin, bi sedan welatparêz kuştin, qirkirinên irseyî pêk anin, gund, navçe bajarên hilweşandin, talan irin; bi destê hêzên xwe yê nî welatparêz, nivîskar, roj-amevan û rewşenbîrên Kur-an kuştin.

Belê, di jwariya sala

1992'yan, hê xwe ji serê salê ve diyar kiribû. Gerîla zivistanê gelek baş nixandibû, amadekariyên xwe, ji bo êrîşên xurt didomand, di nav gel de, birêxistinîya xwe, xwe gihandibû qonaxêke bilind, gel jî, ji bo livbazîyan û ji bo serhildan-an bi can û giyana xwe ve amade bû. Dew-letê jî, bi vê di-zanibû, lewre jî, bi metodên kontr-gerîla li dû provakasyon-an digeriya, armanc tîk bi-rinbû. Bi alika-riya çapemenî û navgînên ragi-handinî yê nî din, vê plana xwe derbasî ji-yanê kirin, berî-ya Newrozê bi mehan, dest bi propagandayê kirin. Digotin, "Wê Kurd îsyân bikin." Gund navçe û bajarên Kurdistanê, bi çekên giran dagirtin..

Û NEWROZ

Li Kurdistanê gel, bi hemû awayî amadekariyên xwe yê nî ji bo pirozkirina Newrozê tem-am kiribûn. Ji bo wan New-roz, li gor germiya têkoşinê bi wateya hilpişkin û serhildanê bû. Bi vê bawerî û hêzê, li he-mû gund, navçe û bajarên Kurdistanê agirê Newrozê geş kirin û li der û dorê vî agirî, bi kincên xwe yê cejnê û bi alên kesk û sor û zer xwe bi girseyî kom kirin. Dest bi meş û xwepêşandanê kirin û dewlet li gor bernameya xwe ya tîkbi-rinê, bi wan çekên giran ên ku li bajarên bi cih kiribûn, agir reşandin ser gel. Qirkirina ye-kenî li Şîrnexê çêbû. Şerekî dijwar di nav hêzên dewletê û

milîsên gel de, dest pê kir. Leşker, bi çekên giran, bi tanq û topan agir direşandin ser gel û gel li ber xwe dida, kuçe û kolanan bi xwîna xwe diparastin. Dawî li seriya 30 wêlat-parêzên Kurd, çî zarok, çî jin û xort hatin kuştin û ev berxwedan di rûpelên dîroka têkoşinê de, di nav rûpelên zêrîn de cihê xwe girt. Dewletê pêşî tenê li Şîrnexê qirkirineke wi-ha dabû ber xwe. Armanc, tir-sandina Kurdên li herêmen din bû. Lê bi vê bawerî, li gund, navçe û bajarên Kurdis-tanê serhildanên girîngtirin pêk hatin. Cizîr, Nisêbîn, A-med, Farqîn li piya bûn. Xwe-dî li birayên xwe derdiketin û protestoyên girseyî pêk diha-nîn. Lewre jî dewlet, li de-verên din jî dest bi qirkirinan kir, Cizîr û Nisêbîn bi dehan şehîd dan, lê serî netewandin.

Newroz, li bajarên mezîn û



Enstîtuya Kurdî, kelepora têkoşinê...

li metropolên Tirk jî bi meş û xwepêşandanên girseyî ve pi-roz bû. Li bajarên Serhedê, li Amedê li deverên din, Kurd li ser lîngan û li dora agirê serx-webûnê di serhildanê de bûn.

Newroza 1992'yan, bi şe-hidbûna li seriya 150 wêlat-parêzên Kurd û bi hêzbûn, xurtbûn, û geşbûna agirê serx-webûnê dawî lê hat.

BER BI ARTÊŞBÛNÊ VE

Artêşa Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ARGK) bi êrîşên xwe yê nî hêz di riya Artêşbûna Neteweyî de, gavên girîng avêtin. Bi destpêka bu-harê re, êrîşên gerîla, li hemû herêmen Kurdistanê, çav li leş-kerên dagirker venekirin. Bi sedan gerîla, bi dîsîplîna artêşî, bi ser gelek qereqolan ve gir-tin û bi sedan leşker kuştin,

cerdên ser qereqolên Navşan; Alan, Bille, Xilva, Nirve û ge-lek qereqolên din, hêza gerîla nişan da û bû tîrsa dilê dewle-ta-dagirker. Gerîla, ne tenê bi êrîşên ser qereqolan, herwiha bi kontrola riyan, bi êrîşên ser gundên cerdevanan, bi êrîşên ser avahiyên dewletê yê nî navçe û bajarên Kurdistanê, bi cezakirina sîxûrap, bi şerê Ba-şûr yê li hember Tirkiyê û Enî-ya Kurdistanê, hêza xwe û xurtiya xwe di qada navneteweyî de îspat kir. Û ji bo hêviyên gel bûn mizgîna serx-webûnê. Bi van êrîşên gerîla-çetevaniya cerdevanan îflas kir. Dewlet di warê leşkerî de, kete tengasiyêke mezin. Lew-re jî, hêzên xwe yê nî der-xiste holê...Dewlet bi hin a-wayên din jî, ji bo xwe weke welatekî demokratîk nişan bi-de û di qada navneteweyî de neyê tewandarkirin politikayên


durû û dualî meşand. Hi-kûmeta koa-lisyonê, di beyanên xwe yê nî ewil de, qala nasandî-na "Realîteya Kurd" dikir. Lê ev realîte weke hercar, qirkirin, ta-lan kirin êrîşên kontr-trayan û hwd. bûn

KONTRA NAVÊ XWE GUHERT: HÎZBÛLLAH

Dewlet di destpêkê de, dix-west ku cerdavanîyê li bajarên jî bi cih bike. Lê, cerdevanî, bi pêşveçûna têkoşinê re, îflas ki-ribû. Bi tu awayî alikariyêke

girîng ji wan çenedibû û bicih-kirina sistemek wiha li bajarên gelek zor bû. Ji ber van sêde-man, dewletê kontr-gerîla li bajar û navçeyên Kurdistanê bi cih kirin. Cara yekêmin Wedat Aydin, ji aliyê ve hêzê ve di 1991 î de hatibû kuştin. Dû re jî ev kuştin dîmîyabûn. Lê, gelê Kurd, bi van êrîşên kontr-gerîla, bêhtir bi hev ve dihatin girêdan û protestoyên wan zêde dibûn. Lewre jî, di-viya ku hêzek din, ku bikaribe di nav gel de ji cih bibîne der-keve holê. Pêşî, bi hin belavo-kan dest bi propagandaya dîni kirin. Dû re çend kesên lumpên û xayîn dane hev û dest bi kuştina welatparêzan kirin. Êdî navê kontr-gerîla bûbû "Hîzbûllah". Cara yekê-min Mikail Bayru li Hezexê kuştin. Mikail Bayru mirovek Asûrî bû û li herêma gelek di-hate hezkirin. Bi kuştina Mi-kail Bayru armancê wan, di nav Kurdên musulman û yê nî din de nakokî derxistin bû. Dû re êrîşên wan domîyan. Bê he-def mirovan kuştin. Welat-parêz hemû jî bo wan bûne hedef. Bi giranî, li Batmanê, Farqînê Nisêbînê û Amedê êrîş birin ser gel. Lewre ev der navendên têkoşinê bûn.

Piştî ku rojnameyên welat-parêz û şoreşger rûyê wan ê tarî eşkere kirin, dest bi kuştî-na rojnamevanan kirin. Bi gi-ranî, piştî derketina Özgür Gündem'ê der mafê hizb-î kontra de tu tiştên veşarî ne-man, tîkiliyên wan yê nî bi dewletê re hatin îspatkirin û gel bi temamî wan nas kir. Ji ber vê yekê berê xwe dan rojnamegeran û di nava 2 me-han de 8 rojnameger kuştin û 1 jî birîndar kirin. Di nav van rojnamegeran de, nivîskarê Welat Huseyîn Deniz jî hebû.



Gerîlayên ARGK'ê derbeyên xedar li hêzên dewletê xistin.

Dû re dor hate ser xortê 74 salî, kelepore têkoşîna Kurd Musa Anter. Ev hêza eşkere destên xwe yê bi gemar di xwîna Apê Musa de jî gerandin.

Ji destpêka livbaziye hîzb-î kontra û heta niha, nêzîkî 400 welatparêz hatine kuştin. Xuya ye ku, ger ne bi destê dewletê be tu hêzeke bi vî rengî xurt li Kurdistanê tune ye ku bikaribe di nav salekî de 400 kesî bîkuje.

Li hember vê hêza dewletê gelê Kurd li hin deveran jî bo parastina xwe milîsên xwa ava kir. Li Nisêbîn û Cizîrê ev milîs, rê li ber van livbaziyan girtin. Lê gelê Batman û Farqînê bêdeng nîan, lewre jî li van deran kuştin didomin. Çi bi destê milîsê û çî jî bi destê gerîla, heta niha li seriya 100 kes jî, ji hêla vê hêza dewletê hatine kuştin. Roj bi roj jî bandûra wan tê şikandin û tune dibin.

VALAKIRINA GUNDAN

Dewlet, li gund û navçeyên Kurdistanê, bi armanca koçberkirinê, gelek qirkirin û qetlîam li dar xistin. Gund û mezrayên Kurdistanê bi tanq û topan xera û talan kirin. Bi giranî li Botanê, li dohêla çiyayê Cûdî bi sedan gund, bi vî awayî hatin valakirin. Gundên Serhedê, Wanê, Hekariyê, Amedê bûn hedef ji dewletê re. Heta niha jî 4000 gundî, zêdetir hatine valakirin û xelkê van gundan an li bajar û navçeyên Kurdistanê, yan jî li metropolên Tirk bi cih bûne. Di cerda hêzên dewletê yê ser gundan de heta niha li seriya 200 gundiye Kurd hatine kuştin.

15'Ê TEBAXÊ Û JI NÛ VE SERHILDAN

Salvegere destpêka şerê çekdarî ya 15'ê Tebaxê, jî nû ve gelê Kurd rakir ser piyan û gel cara yekemîn vê rojê bi vî rengî pîroz kir. Ne tenê li Kurdistanê, li metropolên Tirk jî, bi hezaran Kurd derketin kuçe û

kolanan. Tenê li Edenê 30.000 hezar Kurd meşek mezin li dar xistin û dewlet-nedîkarî tu tiştî bike.

Lê, weke di Newrozê de jî kiribûn, jî nû ye provakasyonê li dar xistin û Şirnexê bi tanq û topan xera kirin. Di vê bûyerê de, nêzîkî 100 Kurd hatin kuştin û yê din jî, ji Şirnexê koçber kirin û berê xwe dat qûntara Cûdî.

AKADEMIYA MAHSUM KORKMAZ


Dewlet, jî bo bikaribe rê li ber têkoşîna neteweya Kurd bigire, di qada navneteweyî de jî, ji xwe re li alîkar û hevkaran geriya. Bi dewletên cîran re, peymanan çêkir. Ji bo bikaribe

ye û Suriye jî, li ser pîrsa Kurdî hin peymanan çêkirin.

Akademiya Mahsum Korkmaz, jî bilî wek mirateke têkoşînbûna xwe, di warê perwerdekirina gerîla de temenê xwe tamam kiribû. Akademî hate girtin. Lê akademî êdî welat bi xwe bû. Hemû çiya, newal û deştên Kurdistanê jî bo perwerdekirina şagirtên têkoşîne amade bûn. Lewre jî gerîla wargehên xwe vekîşandin welat û bi cih bûn.

LIVBAZÎ LI BAJARAN BI PÊŞ VE ÇÛN

Livbaziye gerîla, li bajaran, ber bi dawiya 1992 an ve zêde bûn. Bi taybetî li Diyarbekir livbaziye girîng pêk hatin û



Huseyîn Deniz û Musa Anter; xwarzê û xal du rewşenbîrên Kurd, şehîdên welat.

PKK'ê weke hêzeke "terorîst" bide qebûlîkirin, gelek tawiz da welatên Ewrûpa û hwd. Tirkî-

roj bi roj jî zêdetir dibin. Li metropolên Tirk jî, livbaziye wiha didomin û wisa xwiya ye ku dê li van deran êrişên gerîla zêdetir bibin.

LÎSTIKÊN DEWLETA TIRK Û ŞERÊ BAŞÛR

Dewleta Tirk jî bo bikaribe rê li ber têkoşîne bigire, bi alîkariya Eniya-Kurdistanî, li başûrê Kurdistanê êrişek bi ser hêzên gerîla ve bir. Ev şer nêzîkî 20 rojan domiya. Gelek pêşmergeyên Eniya Kurdistanî jî alî gerîla ve hatin kuştin. Nêzîkî 150 gerîla jî mirin. Dewleta Tirk bi hêza xwe ya leşkerî, bi tanq, top û balefiran ketibû başûrê Kurdistanê, lê bi



Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê ji gelê Kurd re bû hêviyeke mezin.

zayıtên mezin vegeriya û tu tişt bi dest nexist. PKK jî bo ev şerê birakujîyê raweste, bi Eniya Kurdistanî re peymanekê çêkir û şer rawestiya.

MIZGÎNIYA DÎROKÎ: MECLÎSA NETEWYÎ

Hilbijartinên Meclîsa Neteweyî yê li Ewrûpa mizginiya vekirina rûpelek nû da gel. Ev meclîs bi emû awayî bû hêviyeke mezin ji serxwebûna gelê Kurd re. Hilbijartina yekemîn yê delegeyan bû. Li hemû bajarên Ewrûpa, jî bo hilbijartina delegeyan gel, di 20-22 yê Mijdarê de, çûn ser sindoqan û delegeyên xwe hilbijartin. Ev 153 delegeyên ku wek nûnerên gel hatibûn hilbijartin, di 19-20'ê Kanûnê de, jî bo hilbijartina 15 mebûsên meclîsê li Almanya civiyan û mebûsên meclîsê hilbijartin.

Bi vê hilbijartinê ve, Kurdistan cara yekemîn bû xwediyê meclîseke serbixwe. Û meclîs bû xebata herî girîng di sala 1992 an de.

1992 DI WARÊ ÇANDINÎ Û ÇAPEMENIYÊ DE ÇI ANÎ?

Têkoşîna Neteweya Kurdistan, di gelek waran de, bîdestxistinên nû anî. Qedexeya li ser zîmanê Kurdî rabû. Cara yekemîn li bakûrê Kurdistanê weşanên Kurdî derketin. Ji alî hin kesan ve bi navê "Rojname" hejmareke prova derket, lê hew bi wî ma. Dû re rojnameya we Welat dest bi jiyane kir û heta niha jî bi awayekî periyodîk û bêertilandin didome. Welat bi hêza ku ji gelê xwe distine, roj bi roj xurttir û tekûztir bû. Ev bû cara yekemîn ku rojnameyêke wiha xwerû Kurdî bi rêk û pêk derdikeve. Dû re kovara "Rewşen" ê derket. Rewşen jî heta niha tevî hin astengiyan jiyana xwe didomine. Nêzîkî 40 pirtûkên bi Kurdî ketin kutupxaneyên xwendevanan. Rojnameya Azadî (bi Tirkî-Kurdî) û çend kovar û rojnameyên din jî derketin. Özgür Gündem


(her çiqas bi Tirkî be jî) wek berhemeke têkoşîne, xizmetên girîng pêk anî û hê jî xizmetên xwe didomine. Bi dehan qaset derketin. Navenda Çanda Mezopotamya, di warê çanda Kurdî de, bû mînak ji hemû saziyên Kurd re. Dawî Enstîtuya Kurdî wek kelepore NÇM'ê jî nav vê saziyê derket. Di warê zanistiyê de, bû cara yekemîn ku di nav sinorên Tirkiye de, saziyeke Kurdî ava dibe. Enstîtuya Kurdî, tevî hemû astengiyan, xebatên xwe didomine.

BI GIŞTÎ 1992!...

Me di serî de, jî bo 1992 an gotibû "saleke reş û spî." 1992 bi pêşveçûnên êrişên gerîla ve spî, bi kuştinên welatparêzan ve û bi îxaneta Eniya Kurdistanî ve reş bû. Bi hilpişkiya 15'ê Tebaxê ve spî bi talankirina gundan û qirkirina gundiyan ve reş bû. Bi pêşveçûnên çandîni ve spî, bi hin deformasyon û dejenerasyonan ve reş bû û bi avakirina Meclîsa Neteweyî ve jî her û her spî bû.

Bi rastî li jor gelek tişt kêm man û nehatin zîman. Jixwe, rûpelên Welat jî tîra nivîsandina her tiştî nedikir. Lê 1992 saleke tevlîl, germ bû, erênî û neyîniyên wê zehf bûn, lewre jî, jî ber ku hertiştî cihê xwe girt û eşkere bû, me go saleke reş û spî. Lê ber bi 1993 an ve, spiyên 1992 an hêza xwe parastin û reşên vê salê jî mehû bûn û ber bi tunebûnê ve diçin.

Di têkoşîna berxwedana 1992 an de, li seriya 2500 kes jî hêzên dewletê, nêzîkî 400 gerîla, 500 welatparêz, 500 cerdevan û xayîn, 100 kontra û 200 gundî hatin kuştin. Ev tabloyêke bi xwîn e. Lê têkoşîn xwîn divê û gerekên wê tene cih. Sala 1993 yan bi ser vê tabloyê ve tê. Lê li gor agahiyan digihên me, 1993 dê bi be sala têkoşîna li bajar û metropolên Tirk. Aboriya Tirkiyê hedefa 1993 an ê gerîla ye. Û têkoşîn her berdevam e.



Ordîya Tirk ji lîs û hêrsa xwe bajarekî wek Şirnexê wêran kir.

PÊNÛS

Amed Tigrîs



Dijmintiya Kurd û Tirkan

Çendekê berê min û çend hevalan li ser dijminatîya Kurd û Tirkan a ku her roj diçe zêde dibe, sohbet kir. Hevalan behsa çend bûyer kirin ku wan bi xwe li metropolên Tirkîyê bi çavên serê xwe dîtine. Paşê em di vê babetê de li ser ew nûçe û bûyerên ku di çapemeniyê (medya) de derdikevin sekinîn. Hevalan destnîşan dikir ku wiha bédengî dom bike, dewleta Tirk dê dijminatîya ku xistiye navbera Kurd û Tirkan bêhtir tûj û dijwartir bike. Ev dijmintî dikare li herêma Tirkîyê felaketên mezin bi xwe re bîne. Dikare di carekî de bi sedan an jî hezaran kes bîn kuştin. Mal û cihên karên Kurdan bîn talan û wêrankirin. Dewlet bi program û plan haziriya wê rojê dike. Ji aliyekî ve xelkê Kurd ji gund û bajarên Kurdistanê bi darê zorê derdixin û wan ber bi Tirkîyê ve dişeynin. Tengezar dikin. Ji aliyê din ve ew

Lê, ji bo Tirkên pêşverû, demokrat û sosyalist gelek îmkân û riyên din hene. Ev kar û xebat dikeve ser milên wan. Wezîfe û berpirsiyariyên wan in. Ew dikarin di nav partî, rêxistin û komeleyên xwe de li dijî nijadperestî û şovenîzma dewleta xwe rawestin. Semîner û panelan çê bikin. Di rojname, kovar, radyo û televîzyonên xwe de propaganda biratiya Kurd û Tirkan bikin.

Kurdên ku diçin herêma Tirkîyê, xanî nadine wan. Kar nadine wan. Ên ku karên wan hene jî ew ji kar davêjin. Tirk ji dukandarên Kurd tişt nastînin. Li Adana, Antalya, İzmir, Stenbol, Bursa û gelek bajarên Tirkîyê yên din polis her roj êriş dibin ser taxên Kurdan. Rojname kovar, radyo û televîzyonên Tirkan û hemû bûne wek organên polîsan. Heta bi hev û du re ketine hemberiyê ku kî zêde dewletê diparêze.

Derî çend kesan pîrraniya ronakbîrên Tirk jî di xizmeta polîs û leşker de ne.

Baş e, mirov wek Kurd dikare çi bike û wek Tirkekî demokrat û pêşverû dikare çi bike?

Bi dîtina min mirov wek Kurd tiştêkî ku zêde hebe û bike tune ye. Ji ber ku Kurdan ji ser salan ve heta îro jî derî daxwaz û xebatên biratî û aştiyê tu dijminatî bi gelên cîranên xwe re nekirine. Heta ji dagirkerên welatên xwe re gotine "dost û bira" ku wê helwesta wan mala Kurd û Kurdistanê xerab kiriyê û aniye wan roj û reşwa îroyin. Kurdên dîndar jî felsefa dîni ve, yên demokrat jî aliyê felsefaya demokratî û yên sosyalist jî, ji aliyê felsefeya sosyalistî ve dijmintî nexwestine û herdemê biratî û dostahî xwestine. Û ji ber vê yekê jî her dem Kurdan wenda kiriyê. Îro jî Kurd nikarin zêde tiştêkî bikin, ji ber ku Kurd di parlamentoya Tirkîyê de dibêjin "ez vê sondê ji bo biratiya gelê Kurd û Tirk dixwim" parlamenterên Tirk êriş dibin ser parlamenterên Kurdan. Mirov ji yekê re bêje em "bira ne" û ew li mirov bixe, êdî nikare tiştêkî bike. Ji vê dewletê, ji vê parlemtoyê, ji vê civakê çi tê payîn. Di welat û civakeke wiha de ne bi tenê Kurd mirov, dikare çi bike gelo? Ji derî jiyane yanî ji derî berxwedan û têkoşinê jî bo Kurdan rîyeke din tune ye.

Lê, ji bo Tirkên pêşverû, demokrat û sosyalist gelek îmkân û riyên din hene. Ev kar û xebat dikeve ser milên wan. Wezîfe û berpirsiyariyên wan in. Ew dikarin di nav partî, rêxistin û komeleyên xwe de li dijî nijadperestî û şovenîzma dewleta xwe rawestin. Semîner û panelan çê bikin. Di rojname, kovar, radyo û televîzyonên xwe de propaganda biratiya Kurd û Tirkan bikin. Mafên Kurdan ên netewî û demokratîk biparêzin. Rexne li dewlet û hukûmeta xwe bikin. Ew li dijî polîtîka dewleta xwe derdikevin ku Kurdistanê talan û wêran dikin. Raya giştî di vî warî de çê bikin. Lê hazar mixabin ronakbîrên Tirk pîrraniya wan wek leşker û polîs difikirin. Ew dixwazin zêdetir Kurd bîn kuştin û Kurdistanê wêran kirin. Hinek jî bê deng in. Çend kesên ku di vî warî de hişyar û aktîf in, der û dora wan jî gelek teng e. Tesîreke mezin nikarin li ser gelê Tirk bikin. Lê tiştêkî ecayîb e ku hinek "ronakbîrên Kurd" jî, li hember van ronakbîrên Tirk in ku ew çima alîkariya Kurdan dikin. Gelo hewqas dijmin ji me Kurdan re ne bes e ku ew dixwazin ev çend kes jî bibin dijminên me Kurdan? Ji ber vê yekê her roj rexne li İsmail Beşikçi, Yalçın Küçük, Haluk Gerger, Ertuğrul Kürkçü û hwd, digirin.

Vekolanên li ser dengnasî û peyvsaziya dîrokî ya zimanê Kurdî û zaravayên wî

Prof. PIERRE LECOQ

Alîkarîkirin û wergerandina Mamo Cûmî



2- Ziman û zarav:

Em dixwazin li ser wateya ziman û zaraveyan rawestin. Ev yeka hanê, li her derî bi pîrr awayan hatiye girtin. Wateya herî hêsan û zanistî André Martinet di pirtûka xwe, "Les éléments de la linguistique générale" (Egerên Zimannasiya gelemperî) de, pêşkêş kiriyê. Çawa mirov dikare ziman an zarava an jî zar (languge) binase? Hêsan e mirov têbigihêje ku zar navgîneke danûstandinê ye. Çawa mirov sîstema zar ji sîstemên dinê yên danûstandinê ve diqetîne? Li gor A. Martinet, sîstema zar bi du awayan dibe, jê re dibêjin; lèvkirina cotik. Em gotina "hesp nimûne bidin. "Hesp" nîgarekî dengdar e, bi dev tê gotin, bi guhan tê bihistin. Nîgarê dengdar ê "hesp" jî wan tîpan tê ye hev: h-e-s-p. Bi giliyeke dinê, çi gotin be, ji dengdar û konsonan hatiye hev. Her zimanek çend dengdar û çend konsonên wî hene ku mirov dikare gotinên bêjimar jê çêbike. Vêca, A. Martinet dibêje: "Lèvkirina yekê jî dengdar û konsonan dest pê dike; lèvkirina dudiyên jî, ji çêkirina peyvan dest pê dike. Eger ji bo milyonên tiştan, nî-

garên wan ên dengdar hebin, ne devê mirovan dikare wan derxîne, ne jî guhên mirovan dikare wan nas bike. Vêga çi ças navên tiştan hene, tev ji dengdar û konsonan tene hev, bi gotineke dinê bi du awayan dibin. Zimanê dinyayê tev wiha ne, çû nû çi kevin. Ziman ji hev cuda dibin, ji her ku dengdar û konsonên wan ji hev cuda ne; ev jî dihêlê ku çêkirina peyvan jî, ji hev cuda be. Ev nêrîn dihêlê çi hengameyên (dengkirin) li ser cudahiyan ziman û zaravaya hene tev bê kelk bin. Fransîzî zimanek e, Patwa jî zimanek e; Kurdî jî kîjan warî ve bibî zimanek e.

Wateya zaraveyan tiştêkî dinê ye. Ziman di nava dîrokê de tê guhartin. Gava zimanek li herêmeke mezin belav dibe (mîna çawa Latîni li Espanya, li İtalya, li Fransa, û hwd... belav bûye, li gorî deveran tê guhartin. Ka em nimûnekê bigirin çawa ji zimanekî zarav çê dibin. Em bibêjin di zimanekî de tîpa (k) heye, ew tîp di nav demê de wisa tê guhartin (Em navan li ba xwe datînin- wergêr):

Em bibêjin gava tîpa (K) li Kurdistanê belav dibe, li Mehabadê mîna xwe dimî-

ne; li Amedê dibe (KH); li Zaxo dibe (Ky). Pê re gava li herêma Amedê belav dibe, li Dêrikê dibe (Ç), li Silîvanê winda dibe, li Semsûrê dibe (X); gava li herêma Zaxo belav dibe, li Bamernê dibe (Ş) li Şengalê dibe (Ç).

Vêca, zaravkirina zimanekî, ango çêbûna zimanên hevxişk, rastiyeke herdem e. Wiha, em dikarin bibêjin çi ziman be ji destpêkê ve zarava bûye. Lê gotina "ziman" gotineke mak e; "zarava" li gor wê çêbûye. Fransîzî zaravayekî Latîni ye, Espanî zaravayekî Latîni ye; eynî wiha jî, Farisî zaravayekî İranî ye, Kurdî jî zaravayekî İranî ye.

Gava li Mehabadê (K) nahête guhartin, jê re dibêjin "kevinbûn" li Amedê û Zaxo "nûbûn" e. Nûbûyîn hene mîna hev in, hin jî hene ne mîna hev in, hin jî hene ji dan-standinê hatine. Sedemên wan ji pêwendiyên aborî hatine, an jî mirovatîyê hatiye, an lêhatin e, û hwd...

Mesela zimanê Kurdî û zaravayên wî û ciyê wî di nav zimanên İranî yên rojava de divê wisa lê were nêrîn.

Sernewi: Kal Gaxun

Her mîletê guerê xwi edet ci êsto. Sê her mîletê dinya mîletê Kurd zi sernewi cina pîroz kena, la goerê edetu xwi pîroz kena. Kurdistan di daha zaf goerê sernamê Rumi şin riyera. Sernamê rumî 13 ruêj bad sername Miladî ra yeno. Yonî Kurdistanî di sernewi 13 ruêj sernewi rumiya pê yeno pîroz kerdiş.

Sernewuni di yo kay yenu kaykerdiş, ini kayra Kal Gaxun yenu vatiş. Ini kay cuaver her Dewi di beli tuin comiyerdun kay kerdîyeni, la ini serun pîyinuni di daha zaf xwêrt kay kênî. Xwêrt Dewi di yo kiye di yenî piyesser, ita xwertunra yo benu Kal, kincun diratun, qerpalunun dun xwira, ri yi pê yo maskê gênî, ri yi, gijik yi pê ardu kênî sipiye. Yo xwert zi fistanê cîniyan dun xwira, çit unceno xwi sari beno vev. Ca



cawira di yo zi benu deva, nuni zi benu astawar. Hiri çeher tîni zi ri xwi pê tenê kênî siya bîni erêb. Vev nişnêni astawar û piyêri piya kiyeb kiyê gîrenî. Xwêrt û qij dewi zi kuênî yin dima. Her kiyê di semêd wahar kiyi ya kay kay kênî, guevend gîni. Qij kiyî pê kal biyequnî (yarî) kênî, xwêrt kiyî dumarê vev gîrenî, erêb kuên qijun û xwertun dima, vev û kal qîri kênî. Kal xwi erzeno erd û pê qêsta mireno, hetun wahar kiyî çi medu ci niwirzeno. Wahar kiyî ra run, ardun, guazun, bastiyeq û çiyu bin gîni û şîni. Kiyun piyerinra ina çi dun ariye û şîni kiyê xwi vîri di yenî piyesser. İta pa xwertun dewa çi xwi wêni a hetun dîst sibay kay kênî.

Seyitxan Quric

Li piyaseya Unkapani qasetên bi Kurdî - 2

Muzîka Kurdî talan dikin

ZİYANO - BERIVANO



Zana Farqînî

Gava mirov li qasetên bi Kurdî guhdarî dike dibîne ku lédana amûran ji muzîka Kurdî re gelek biyan e heta bêhna muzîkên biyanî jê tê. Ango ji çêj (tama) û ekle muzîka Kurdî pirr durr in. Qasetên ku ji vî alî ve baş in, an li Ewropa bingeha wan hatiye çêkirin û bi şûn ve li Tirkîye û li Kurdistanê hatine belavkirin an jî, mîna Navenda Çanda Mezopotamya, Hilberîna Muzîkê ya Stran û Hilberîna Muzîkê ya Mezopotamya ku bi giştî qasetên xwe bi Oğuz Abadan didine çêkirinê ne.

Li Unkapani'yê hem stranbêj û hem jî rêvebirên muzîkê ji muzîka Kurdî fêm nakin. Tenê dikarin bistirin. Rêvebir ji, ji muzîka Kurdî re xerîb û biyan in, bandûr û teşîra muzîka arabesk li ser wan gelek e. Ji pîrsa me ya, "Gelemşeyên we der barê naskirin û lédana amûrên Kurdî de heye" re, rayedarê Ses Plak Gülhan Tabak: "Ji vî alî ve dijwariyên me hene. Elemanên pispor nîn in. Ev rewş jî, ji qedexeyan tê. Lê di vî warî de hewldanên amatori hene" bersiv da.

Qasetên ku herî tîr firotin ên gelêrî û otantik in. Naverok jî siyasî. Lê ji aliyê wêjeyî ve (edebî) lê bê nihêrîn qelsbûna naverokê bi hêsanî tê ditin. Gotin pirr hêsan in, tişteki nû lê nehatiye zêdekirin. Ev yek jî, ji nezanbûna zimên tê. Tişteki din jî heye ku helbestên tîr xwendin, ji aliyên wan stranbêjan ve bi giştî ne yên wan in. Ên stranbêj, dengbêj û hunermendan e. Koma Berxwedan, bi taybetî ji bo wan kesan nolî kaniyek e.

Xwediyê Mazlum Plak'ê Behram Yurdakul ji pîrsa, "Bi giştî ji

kîjan celeb û cureyan qaset tîr firotin" re bersiva me wiha da: "Qasetên folklorîk ku naveroka wan politik in zêde tîr firotin."

Dijwarî û astengiya herî mezin a li dijî zêde belavbûna qasetan 'qasetvaniya qorsan' e. Qasetvaniya qorsan hem zirareke mezin dide şirketan û hem jî dide stranbêjan. Ango ev qorsanvanî pişt li wan şikandiyê. Ev qorsanvan debara xwe li ser şirketan û stranbêjan dikin, keda wan dixwin, wan dizerînin. Nahêlin ku yên hem qasetan çêdikin û hem jî belav dikin tevî stranbêjan, ji berhemên xwe kêr û sûd bistînin. Ev rewş, dibe sebebê ku hem çêkirvan û hem jî stranbêj careke din çalakîyên xwe bidomînin.

Ji pîrsa, "Li hember zêde nefirota qasetên bi Kurdî çî asteng hene?" re hema hema hemû şirket weki hev bersiv dan. Qasetvaniya qorsanî. Ji vî pîrsê re rayedarê Nepa Müzik Üretim Zafer Başeran: "Ji bo me gelsa herî mezin qasetvaniya qorsan e. Qasetên me jî hêla wan ve mîna eslên qasetan tîr çêkirin. Kesê ku nizanibe lê wernaqile." bersiv da me.

Nemaze qasetvaniya qorsan, li Amedê, li Dilûkê (Entebê), li Bilecûk û hwd. tîr kirin. Wisa çêdikin ku rih û giyana mirov pê nahe-

Ev e du sal e di piyaseya qasetên bi Kurdî de bi milyaran pere tê de digere. Gani Nar di hevpeyivîneke xwe de ku di rojnameya Özgür Gündem'ê de hatibû weşandin wiha digot: "Piyaseya qasetên bi Kurdî heta niha 6 milyar pereyê Tirk bi şirketan daye karkirin." Belê ne 6 milyar lê, belkî bi 6 milyaran pere bi wan dabe karkirin.

Ji pîrsa ku, "Hûnê di pêşerojê

de jî qasetên bi Kurdî çêbikin, an ku hûn çêbikin mebesta we çî ye?" re bersivên pirr balkêş hatin dayin. Ji bilî Nepa'yê tu şirket armanca xwe ya berahîn negot, anga tenê Nepa got ku daxwaziya me bazirganî ye. Bersivên wan şirketan der barê vî pîrsê de wiha nîn.

Ses Plak Kaset: "Demek bi şûn ve ez dixwazim bişemirînim (biterikînim). Armanca me min hebû, bi rastî min peywirekê dabû ser milên xwe. Ez difikirim ku min vî peywire aniyê çî. Ger a niha çend şirketên qenc vî karî bi babetî (layiqî) binin çî, ez vî gavê jî amade me jî şemirandinê re."

Ataman-Sevkan: "Belê em dixwazim çêbikin. Ji pîrsa, "Ji ber çî hûn dixwazim bidomînin" re jî: "Me dema ku çêkirina qasetên bi Kurdî qedexebûn jî, vî karî didomand. Armanca me jixwe çêkirina qasetên Kurdî ye." Diyar: "Belê em difikirin." Çima?: "Ev kar mîna qumarê ye. Lê di sa mesrefa xwe derdixê." Mazlum: "Belê jî çêkirinê re ez difikirim. Min tatmîn dike." Der barê çêkirina qasetên bi Kurdî de armanca we çî ye re jî vî bersivê da: "Çima ji ber ku em pê tîr darizandin, pê tîr mehkemekirin. Jixwe amblema me vî yekê baş diyar dike. Em Kurd in. Em li doza xwe xwedî derdikevin. Repertuwarê me gişt bi Kurdî ye. Ez vî karî weke peywirekê dibînim." Özdemir: "Min dev jê ber da, zîrar kirim. Êdî naxwazim qasetên bi Kurdî çêkim."

Oskar: "Ez diramim. Emê vî karî bidomînin." Ji pîrsa, "Ji bo çî hûn dixwazim bidomînin?" re jî, pîrsa me bê bersiv hişt. Nepa: "Em dê bidomînin. Bi taybetî jî qasetên Şivan em dê biwêşim, ên

evîni." Ji bo çî: "Armanca me jixwe ticaret e. Di vî warî de valahiyek hebû. Ê ku cara pêşî vî valahiyê dagirt jî em bûn."

Ev vekolîn dide nîşan ku li civaka Kurdî mîna çî hê talankirinê lê tê nihêrtin. Jixwe civaka Kurdî nolî axeke beyar e, ji her alî ve. Herkes dixwaze li gor berjewendiyên xwe vî beyarê bajo. Weşaxanan jî nemaze hin ji wan, bi mebesta zerrandinê (jê xwarinê) dest avêtibûn çand, dirok, folklor, wêje û hwd. Niha em dinihêrin piyaseya Unkapani jî bi vî armancê dilebite. Ev rewş jî berhemên wan rind diyar dibe. Vêca ne bi aliyek ve bi her aliyê ve. Hem naveroka qasetan, bi lédan û bikaranîna amûrên muzîkê ve, bi lèvkirina peyvan ve anga xwendina helbestan, telafûzkirina Kurdî û hem jî nivîsên ser bergên (qapaxên) qasetan; vî rewşê ku em rexne dikin qenc diyar û rêv û zêde dike.

Em dixwazim çend nivîsên ser qasetan di vir de diyar bikin. Gowend (ku Gowend hatiye nivîsîn), ev qaset di nav berhemên Ataman-Sevkan de derketiye. Navê wê Şew Hinne ye. Divê wiha bihata nivîsîn: Şeva Hinê.

Daweta Kurdî (ku Dêwetâ Kürdî hatiye nivîsîn). Ev qaset jî, di nav berhemên Mazlum Plak de derketiye.

Baki Kaya, "Pepuk Dügünü, bülbül nağünü. Rastiya wê divê wiha bûya. Pepuk dixwîne, bilbil naxwîne. Ev qaset jî ya Diyar Müzik e.

De ki jî mala xwe rabûye û piçek dengê wî-wê xweş bûye, hatiye xwedêgiravî jî xwe re qaset dagirtiye. Bi pirranî zarok û ciwan in, tu agahî û perwerdehiya li ser muzîkê

nestandine, an jî nexwendine. Hema çawa lê hatibe dest bi vî karî kirine.

Armanca mebesta şirketan jî qezenckirin e. Bila pere bê, çawa tê ew bi kêfa xwe ye. Birastî rewşa muzîka Kurdî ku tê de ye gelek ne xweş e. Divê rê li ber vî rewşê kambax bê girtin. Muzîka Kurdî jî vî rewşê bê filitandin. Xebatên bi zanebûn û zanistî di vî warî de bêne kirin.

Civaka me diguhere, bi rastî tê guherandin û di şûna nîrx û hêjahiyên kevin de, nîrx û hêjahiyên nû tîrê afirandin. Tîrê danîn. Divê herwiha muzîka Kurdî jî, ji vî rewşê bê par nemîne. Gereke ev war neyê îhmalkirin. Ger em lê xwedî dernekevin, dê rewşa muzîka Tirkî ya arabesk û dejenerekirî bê serê me jî.

Bang û gaziya me ji muzisyenên Kurd ên welatparêz, demokrat û pêşverû re heye. Dest bavêjin vî warî, van nîrx û hêjahiyên me yên ku bi xwîna şehîdan hatine standin û afirandin nehêlin ku, bazirgan talan bikin û jî bo armanca xwe bavêjin mazatê.

Peywira dengbêj, stranbêj û hunermendan ew e ku me ji aliyê çandî, muzîkî, hunerî û wêjeyî ve derxin radeya gelên hemdem. Bi wan berhemên xwe, xwîn û hêzê bidin tevgera azadiyê. Divê ji bo pêşerojê berhemên nemir bêne afirandin, hem jî bo mirovahiyê û hem jî ji bo nîşên me yên nûhati.

Ger zû lê xwedî neyê derketin, rê li ber niyetxeraban neyê girtin û rewş wiha bidome, muzîka Kurdî jî dejenarasyonê nafîte û herwiha dê di destên cambaz û bazirgan de bibe navgîna berjewendiyên, kêr û fêdeya kesani û şexsî.



Rojîjmêr, dezge (sistem) e ke ku zemên (west) parveyî rojê, heftê, mehê û salê dike. Rojîjmêr, mijara stêrezanî (astronomî) yê ye. Bi her cure dezge xwe ve rojîjmêr, tûşî (teqabilî) bûyerên stêrezaniyê dibe (1). Li gora dezge û bûyerên stêrezaniyê rojîjmêr, bi çar tofa (grub) ve parve dibe: Rojîjmêra Rojê, rojîjmêra Heyvê, rojîjmêra Heyv û Rojê, rojîjmêra Guhêrek.

Roj, hefte, meh û sal bingehê rojîjmêrê ne. Bi awayekî din, roj, hefte, meh û salan dide xuyakirin.

Di kronolojiyê (bi çih û zeman hûrnêrîna bûyerên dîrokî) de rojîjmêr, pîrî çaran bi bûyêrê dîrokî an olî dest pê dike; weku: Afirandina dinê; destpêka olimpiyadan roja mirina Bûda; ji dayîkbûyîna Îsa pêxember (Mîlad); koçkirina Hezretî Muħemed (Koçî); damezirandina Împaratoriya Meda û wekî din...

Li gora senifandinek (tesnîf) din jî rojîjmêr, parveyî ev tofan dibin:

1- Rojîjmêrê Kevn:

- a) Rojîjmêra Misrê (ya rojê)
- b) Rojîjmêra Kasîtan û Babîliyan (ya heyvê)
- c) Rojîjmêra Yûnanîstan a kevn (ya heyvê)
- d) Rojîjmêra Maya û Aztek (olî û rojê)
- e) Rojîjmêra Romê (ya rojê)

2- Rojîjmêrê Olî:

- a) Rojîjmêra Mesîhî (ya heyv û rojê)
- b) Rojîjmêra Kiptî (ya rojê)
- c) Rojîjmêra Mûsevî (Cihû) (ya rojê)
- d) Rojîjmêra Îslamî (ya heyvê)

3- Rojîjmêrê Kevneşopî:

- a) Rojîjmêra Çînî (ya heyv û rojê)
- b) Rojîjmêra Hindû (ya heyvî, ro ya heyv û rojê)

4- Rojîjmêra Nûjen:

Di nav rojîjmêrên kevnî, olî û kevnêşopî de tevliheviyek mezîn hene. Li gora baweremendiya yekxwedanî û pîr xwedanî rojîjmêr hatibûn çekirin. Stêrezenî (astronomî) û stêrenasî (astrolojî) tevliheviyek pêk anî bû. Her diçû rojîjmêrê dîrokî wekî yê Kalde, Îbranî, Misrê, Yûnan, Romê, Kiptî, Çîn; an jî rojîjmêrê Îsraîl û yê Îslamî (Koçî), Hindû, Kampoç, Laos, Vietnam cih didan rojîjmêrê nûjen (2).

Julius Sezar bi reformek bingehî, berî miladê (zayîne) 46. de, rojîjmêra Julyen pejirand (3).

Sal 365 roj dihat hesabandin.

Rojîjmêra Julyen heta 1582 paş miladê (zayîne) domand. Rojîjmêra Julyen jî ji sedî sed ne rast û tekûz bû.

Papa Gregoriusê XIII'yîm, rojîjmêrek bi navê xwe danî (4 Cotmeh 1582). Romê, Îspanya û Portekîzê ev rojîjmêrî bi kar anîn. Ev rojîjmêra zayînî bi gelemperî hatîye pejirandinê. Fransa (1582), Holendê (1582), Katolikên Elman û Swîsre (Îsvîçre) (1584), Polonya (1586); protestanan (1700), Îngîlîstan û Swêd (Îsveç) (1752) yanî du sed sal şûn de rojîjmêra zayînî pejirandin. Japon (1873), Çîn (1911), welatên Ortodoks Rûsya (1918), Romen û Yûgoslavî (1919), Yûnanîstan sala 1923 de, Tirk jî sê sed û çil û sê sal (343) şûn de di 26 kanûna paşîn 1925 de rojîjmêra zayînî pejirandin.

Rojîjmêr (Salname - Teqwîm)

LÊKOLÎN

KAYA MÛŞTAKHAN

Osmanîyan heta sed sala XVI. l'yîmê rojîjmêra Koçî; 1839 de rojîjmêra Rûmî bi kar anîn. Carna jî rojîjmêra Koçî û Rûmî bi hev re dihatin xebitandinê.

ROJÎJMÊRA KURDÎ

Mezopotamya gencîneke (xezîneyek) dîrokî ye. Navenda şarezayî yê ye jî. Wekî tê zanînê dîrok bi nûvedan (îcat) a nivîsê ve dest pê dike. Di erdnîgariya firehiya Mezopotamyayê de pîr gel cîwar bûnin.

Şemsettin Gûnaltay (4) di pirtûka xwe de navê Gûtiyan hil dide. Qonaxa neolîtîkî teqabilî 8000 sal berî zayînê dike.

Gûti gelekî şarezaya bûn. Nivîsîna bizmanî jî alî Gûtiyan hatîye nûvedînê (îcat kirinê) (5. Kasîtan (B.Z. 1800) di hiqûq û felsefeyê de gelek pêşve çû bûn. Hesp jî alî Kasîtan hatîye perwerde kirinê.

Tekera erebê nûvedana wan e. Li gora dezgeya heyvî bingehên rojîjmêrê jî Kasîtan daniye (6). Sumerîyan û Babîliyan jî li ser stêrezenî û stêrenasî (astronomî û astrolojî) xebitîne (7).

Diyar e ku rojîjmêr di nav civakên Mezopotamyayê de hindiktirîn 2000 sal berî zayînê hatîye bi kar anîn. *

Ji Kasîtan heta Medan hezar û çil û heft (1147) sal derbas bûye. Ji Medan û vir ve jî rojîjmêr bi gelemperî didomîne.

Me li jor gotibû rojîjmêr, bi serdestpêkên dîrokî an yê olî dest pê dike. Kurd jî, ji xwe re du bûyerên dîrokî nişan didin. Ya yekemîn yekîtiya Medan (damezirandina serdariya Medan). B.Z. 653

Ya duyemîn sitandina Ninowa (Mûsil) yê ye (B.Z. 612). Li ser yekîtiya Medan dîroknivîsan, dîrokên cuda çûda didin (B.Z.700, 649, 653).

Îro başûrê Kurdistanê rojîjmêra 700'î û rojhilata Kurdistanê jî 612 sal berî zayînê bi kar tinin (8).

Îro başûrê li ser rojîjmêra Kurdî du dîtin an du nêrînên bingehîn hene:

1- Navên mehan yê bingehên wan digihîje Kasîtan, Babîlan û Medan, navên mehan ku bi gelemperî jî aliyê Kurdên Bakur, beşek jî Kurdên Başûr û Rojhilat, Kurdên li Sûriye, Sovyetîstanê, Lubnanê, dixebitînin; di kovar, pirtûk, rojîjmêr, dibistan û enstîtuyên Kurdî de bi kar tinin ev in: Adar, Nisan, Gulan, Hezîran, Temûz (Tirmeh), Tebax, Îlon, Teşrîn (Çirî), Kanûn (Çile) û Sibat (9).

Cihû û Sûriyanîyan jî ev navan bi kar tinin lê navên mehan yê ku civaka gelên Mezopotamyayê bi kar tinin tenê ne Suryanî û ne jî Îbranî ne. Mîrov kare bibêje ev navên enternasyonal in (nav miletî, nav gelî). (Binêrin Lista yekem, navê mehan)

2- Beşek Kurd (bi pîrranî yê zarava Soranî bi kar tinin) jî dibêjin: Navên mehan yê berî zayînê hene, ne Kurdî ne, divê neyên xebitandinê. Navên mehan xwerû divê Kurdî be. Ji bo yekîtiya ziman jî pêwîst e. Rojîjmêrek pardayî, wisa çêdibe. (10). (Binêrin lista duyemîn, navên mehan).

Dibêjin ziman yek e. Malê herkesî ye. Gere guhazîya ditina, navê mehan û rengan neguherîne (11).

Gelo kîjan dîtin rast e?

Bi ya me navên mehan (lista yekemîn) yê gelên rajorî Mezopotamyayê û Zaxosê bi kar anîne; îro jî pîrraniya Kurdan di jiyana xwe de di kovar, pirtûk û rojîjmêrên xwe de dixebitînin rast e. Eger em bermayên (warîs) gelên Mezopotamyayê bin; eger em bi bingeh jî Gûti, Kasît, Medan hatîbin; wekî seydayê Cegerxwîn dibêje:

Em bermayê Med û Sobar û Kasît (in) bin; navên mehan ev çar hezar sal e didomîne rast e. Divê em ev gencîna dewlemend bi destê biyanîyan bernedin. Bi hestek neteweyî navên mehan enternasyonalîst (navê gel û nav neteweyî) bi kar binin û bi perestî biparêzin. Daxwaza me ew e ku Kurdên başûr û rojhilata welêt û kesên din vê mijarî baş bifikirin û baş binirxînin. Meydanê jî bê hisperestan re nehêlin.

Di rojîjmêra Kurdî de tiştên bala me dikîşînin, ev in:

-Destpêka rojan şemî ye; yê Tirka duşem e.

-Destpêka demên salê jî zivistanê digire û bi rêz li dû hev tên (12).

-Yên Tirkan payîz, zivistan, bihar û havîn e. Her wiha Tirk biharê dikin du beş.

-Kurd jî mêj ve, bircan jî nas dikin. Astrolojî (stêrenasî) bi terhek teng di nav Kurdan de cih girtiye. Rewş û tevgera stêrkan, xêr û bera ku ji wan tên der, sêredarî û falzanî, bi gora serboriya stêrkan, dêhatî, û serpêwerên mirovan di stêrkzaniya Kurdan de jî, xwe nişan daye. Lê di bircên Kurdî de

destpêka bircê di kîjan mehê de be, kutahî jî di wê meha li pey de tê (13). Yanî roja pêşî meh dikeve birca xwe û roja dawî jê derdikeve (14).



-Rojîjmêra Kurdî pêş zayînê heyvî, îro rojîjmêra rojê ye.

Daxwaziya me jî ew e ku "hemû rewşên bîrên Kurd hewl bidine xwe ji bo sererastkirin û yekkirina rojîjmêra Kurdî (15).

- 1) Meydan Larousse, berg (cild) II, rp. 856; Memo Larousse, berg I, rp. 178-192
- 2) Meydan Larousse, berg II, rp. 857
- 3) Memo Larousse berg I, rp. 182
- 4) Larousse Gûnaltay Şemsettin, Dîroka Mezopotamya (Mezopotamya Tarihi) 1938 Ankara.
- 5) Botan Amedî, Dîroka Kurdistan û Kurdan, rp. 28; C. Bender, Dîroka Kurdan 21-22.
- 6) Aksoy, Gûrdal, Zimanê Kurda û fesane wê (Kürt Dili ve Söylenceleri) rp. 122
- 7) Botan Amedî û Cemşîd Bender (ibid)
- 8) Feqî Huseyn Sağniç, Rewşen, hej. 3, 1992, rp. 45
- 9) Hawar, Kovareke çandî, ye, Bedîxaniyan weşandiye, 15.4.1932 Şam. Ronahî: Kovara çandî û siyasî 1.4.1942 Şam.
- Azadî: Kovara çandî, marksist, 1978 Paris.
- Rewşen: Kovara Navenda Çanda Mezopotamya, 1.2.1992 İstanbul.
- Welat: Rojnâmeya hefteyî, çandî, siyasî, pêşverû, 22.2.1992 İstanbul.
- Riya Azadî: Kovar PSK, Adar 1982.
- Deng: Kovarek mehane, çandî, siyasî, K. Paşîn, 1989 İstanbul.
- Komal: Weşanxaneyek pêşverû (Kovara Rîzgarî ji weşandin) 1974 Ankara.
- Medya: Kovarek mehane, çandî, siyasî, Nisan 1988 İstanbul.
- Ferheng: (J. Bleau, Gulan 1991 rp. 188-189; D. İzolî, Sibat 1992, rp. 268 İstanbul.
- Kurterastî: Pirtûk, A. Tigrîs, Adar 1991 Stokholm.
- 10) Koma Newrozê: Salname, 1983 Şam. B. Soran: Govend, H.3, Nisan 1992 Amed "Li ser rojîjmêra Kurdî..."
- Dildar Berwarî: Roja Nû, hej.3, 1983 Stokholm "Li ser navên mehan"
- Ferheng: (J. Bleau, D. İzolî, Tewfîk Wehbî, 1971 London.)
- Torî: Alfabeya Kurdî, Tirmeh 1992 İstanbul, rp. 111
- Feqî Huseyn Sağniç: Kovara Rewşenê, hej.3, rp. 45-47.
- 11) B. Soran, Govend, hej.3, 1992, rp.8 "Li ser rojîjmêra Kurdî..."
- 12) B. Soran, rp.7
- 13) B. Soran, rp.10
- 14) Feqî Huseyn, Rewşen, hej.3, 1992, rp.46 "Salname"
- 15) B. Soran, rp.10
- * Li gora çavkaniyek din, Sumerîyan, rojîjmêra xwe berî zayînê (B.Z. 2300-2150) li Nîpûrê de bi kar anîn (G. Aksoy, zimanê Kurda û ... rp.127)

Wê bidome

BI KURDÎ NAVÊN MEHAN (1)									
	1	2	3	4	5	6	7	8	9
	HAWAR RONAHÎ	KOV. AZADÎ PARÎS	WELAT REWŞEN	DENG RIYA AZADÎ	KOMAL SALNAME	MEDYA SALNAME	J. BLEU FERHENG	D. İZOLİ FERHENG	K. NEWROZÊ SALNAME
1	Kanûna Paşîn	Çile	Çile	Çileyê Paşîn	Çile	Çile	Çileyê Paşîn	Çile	Çile
2	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Reşeme
3	Adar	Adar	Adar	Adar	Adar	Newroz	Adar	Adar	Avdar
4	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan
5	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan
6	Hezêran	Hezîran	Hezîran	Hezîran	Hezîran	Pûşper	Hizêran	Hezîran	Pûşper
7	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh
8	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax
9	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon
10	Çiriya Paşîn	Cotmeh	Cotmeh	Çiriya Paşîn	Çirî	Cotmeh	Çiriya Berî	Çiriya Paşîn	Çiriya Paşîn
11	Çiriya Paşîn	Mijdar	Mijdar	Çiriya Paşîn	Teşrîn	Çirî	Çiriya Paşîn	Çiriya Paşîn	Çiriya Paşîn
12	Kanûna Paşîn	Kanûn	Kanûn	Çileyê Paşîn	Kanûn	Befranbar	Çileyê Berî	Berçile	Berçile



Îman Botanî di filmê Selman Fayîq de yê bi navê "Çarenûs" de listibû.

Xebata keçan bûye berz

Xemê Zaxoyî

Ew neviya Ehmed Temer Botanî ye ji gundê Lodê û Şîşilê, ji êla Jêliyan e. Ev êl bi serokatiya lehengê mezin Resûl Axa li Geliyê Zilanê di 1928' an de serhildanek kir... Serhildan bi ser neket û gelek lawên jêhatî ji vê êlê şhid bûn. Di gel vê jî, bi hezaran zarok, jin û kal bi destê dijminî hatin kuştin... Kurdiya vê êlê gelek pak û petî (fesîh) ye. Pirraniya xort û pîrên wan hunerhez û çandhez in. Lewre ji ber sitemê ev êl îro li çar parçeyên welêt belav e...

Çend lehengên vê malbatê

1-Temer, li çanda folklorî gelek stran li ser vî lehengî hene.

Pê da pê da Temero pê da
Neçe Zaxokê neyar id' rê da

B' şûr û mertalî d' bexçeyên koçkê de
(qesrê)

2-Ehmedê Temer, destanek li ser jiyana wî heye. Naveroka wê dewlemend e û ji Botan dest pê dîke û li Mûsilê hew dibe.

Agir e li Mêrdînê, ceng e, ceng e

Gihîşte Misêrbînê, ceng e, ceng e

Silopya behra xwinê, ceng e, ceng e.

Di gel vê jî, gelek rewşenbîr ji vê malbatê derketine; wek: Sebrî Botanî (helbestvan û roj-namevan), Mirad Botanî (helbestvan), Giro Botanî (dengbêj), Mêrem Botanî, Delal Botanî û Sorgul Botanî (heyranokbêj), Kîsra Botanî û Îbrahîm Botanî (muzîkvan), Beşîr Botanî (folklorvan) û hwd.

Hema ji ber van tiştan (sebeb) Îman Botanî hatiye meydana huner û çanda Kurdî. Ew helbestan dinivîse û bûye palevana filmê "Çarenûs" yê ku li Swêdê hate berhevkirin û pêşkêşkirin...

Xwendewarên hêja! Du helbestên Î. Botanî em ji we re pêşkêş dikin.

SERBILIND IM

Ez mamiza çol û çiya me lo
Sîqala nav co û rûbara me ez
Xemla buhar û zozana me lo
Gula zer im, keça Kurda me ez

Ez xweş nişana welatî me lo
Serbilind im, ya şoreşgerî me
Bo hevalê xwe dilsotî me lo
Bo warê xwe jî ez xwinrêti me.

Bo azadiyê l' pêşiyê me ez
Ne bêjin tu keçî taqet nîn e
Îro xebata keça bûye berz
J' bo serxwebûnê, berxwedan jin e!
1984

HÊVIYEK

Dê kengê revin, ev tazi û zêmar
Dê kengê biryên, zindan û sêdar

Dê çi dem helkîn, agirê dijwar
Da pê bisojîn, dijmin û neyar

Dê ji dem xweş kîn, dilê birîndar
Dilaneke bikin, ji bo bendewar
Ji xema dîr kîn, heval, dost û yar
Zevyêk bikêlin, ji bo evîndar

Li dora kom kîn, miletê hejar
Bibî dest bi dest, bikîne hawar.

Ferhengêde Zazakî

L. Jandîl

Musayena ziwana de cayê ferhengî, qe çiyê nêşikino bicêro. Hem rastmusayena mana persa, hem rayştivisnayena û hem ji xoviranêkerdena ziwani rê, ferheng dermanêde tewr qîmetir o. Her çi ra avêr ji ziwane mordemî vind nêbeno, xirab nêbono û nêxerêpîno, waxto ke, ferhengêde mordemiyo rind bibo. Mordem ferhengêde rindî ra çi fam kenê? Na persêde giran a. La belê bê cewab ji niya. Ferhengêde rind gani verê her çi persa, qesa, bîngepersanê yew ziwani, yê pîrîne bicêro. Kamci her de beno wa bibo, persî se ênê vatenê wa bêrê vatene, mana xo gor caya vurîna wa biwuriyo, gani pêro zerê yew ferhengî de bibê. Ne nê teyna. Ziwano rojên, yane persî ziwane rojênî de se ênê kar. Gani mordem manê ke, persan mana xoya taybetiyê/ esasiyê ra cûda guretê, yanê mana didîne; persî û qesê verêna; namê dewa, kowa, dara, teyr û tura, ebi kilmiye namê her çi zerê ferhengî de bivîno. Her kes bişikiyo ci ra fam bikero. Persî koti de derg, koti de kilm ênê wendene; kamci herfe yan ji pirtike mordem hûşka (beton/ vugu) vano, zerê ferhengî de bêrê diyene. Ferhengêde niyanên ebi diyalekta za-

zakî esto? Nê, çino. Hatani nika teyna yew ferheng ebi zazakî amo vetene. 'No ji Malmisaniji nivisno. Karê Malmisaniji rê vatenêde ma çina. Heq ci ra razi bo. Karo ke amo de ser, mordemeki kerdo. La belê mi se cor va, nê ferhengî de kêmasî estê. Ez nêzanena Malmisaniji hona nê ferhengî ser ro xebetino? Yan ji nêxebetîno. Yanê wazeno nê ferhengê xo hira û girs kero? Yan ji nê?

Xêca nayê xêlê hevalanê rewşenbîra waştene karê yew ferhengî ebi kurmancî bikerê. La belê hatani nika kesî ra veng nêveciya. Ferhengo ke D. Îzoli veto wertê de niyo.

Mi sera 1989 de dest bi komkerdena persanê zazakî kerd. Êno mi virî, dawiya na sere de qasê 92 persî ebi tipê "a" ye, qasê 318 persî ebi tipê "b" ye mi kerdîbî kom. Komkerdena persa ebi raştîyê xêlê zamet a. Her roj çiyê êno mordemî vir. Ebi şewe, hewn de, rayê ra, cayê karî de, mucilbiyene de, her ca û her waxt persî ênê mordemî virî. Gani ti nê persa de niyadê, hela lewê to de estê yan ji çînê, eke çînê gani ti binivisnê. Mordem teyna ebi nayê ra nêxelesino, gani mordem her dem, her sahatê, her muciliye de bifikiriyo, balê xo, goşê xo persa û qesa ser no ke, bizano; kamci persî lewe de estê û

kamci ji çînê. Nayê rê ji karê ferhengî karêke derg o, karêde sera wo.

Emser, çand aşmî nayê ra ver mi dest bi nivisnayena mananê persa kerd. Mi di ke, 92 persî ebi tipê "a" ye biyê 510 û 318 persî ebi tipê "b" ye biyê 435 hebî. Roj bi roj ji tayîna benê zêde. Hatani nika nêzdiyê 7500 persî amê komkernene. Wertê nina de namê û watenê verêna çînê. Tenga ke ez tede ra, kêmasiya ke ez tede ra, a wa ke, kesê ke na diyalekte rind zanê, çînê. Mordem nina nêvînenê, nê vindbiyayê wê. Êwê ke zanê jî, xo Tirk hesabnenê. Feydo ke, nina ra êno, wa qe mero tayîna rind o. Na derheq de se ke D.Îzoli nêvano ez jî "hetkariya/ arikariya tewr girse komputurî ra cêna".

Ez îta şima wendekara, rewşenbîra, welatparêza ra rica û dexalet kena, kami dest ra çi amê wa bikero, pêde medo. Her kes xo het ra der û dorê xo de/ra persa, namanê dewa, kowa, tûma, dara, teyr û tura, merga, hêgaya, zinar û kemera, vaşa, çimiyê werî/ wêrdene, tar û turî, qesê verêna ûêb. teba mana dînanê kurmancî yan ji Tirkî ebi destê rojnama Welatî yan ji kovara Rewşenî ma rê birûşno. Ez bawer kena ke, her kes şikîno nê karî bikero. No karêde zor ni yo. La belê gani mordem naye biwazo.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Seriyek e di wê rê de

Gotinên pêşyan

-Dijminên bavan nabin dostê lawan.

-Ji dêla seyê bêhna xweş nayê.

-Ji dijmin û neyaran, bawer nekin tu caran.

-Dinya bi dor e, geh li jêr e geh li jor e.

-Îro dora we sibê ya me ye.

-Demek gulê ye yek ê şîlanê.

-Keysa te ku hat fersend û xebat.

-Serê qijikê qelî jê çênabe.

-Di pira dijminan re nebore.

-Qencyê bike bavêje avê.

-Tu çi tov bikî tuyê wî biçînî.

-Xîret ji îmanê ye.

-Xîret avêtine ber kûçikan nexwarine.

-Bêxîret bê îman in.

-Dikê rojekê be, ne mirîşka sed rojî.

-Serê ku ne li nav seriyên be heqê wî jêkirin e.

-Bêxê çê ji ber kozê ve kifş e.

-Bila jin be jina mêran be bila dijmin be kurê camêran be.

-Bila mê be şîr qismet e.

-Bila rê be, bila dîr be, bila bihur be, bila kûr be bila keça

mîr be, bila bi salan pîr be.

-Heta mirinê çav li kirinê.

-Diz ji malê be, ga di kulekê re dertê.

-Seyê min e li ber dêrê xelkê direyê.

-Kerê min e dijmin lê bûye xwedî.

-Bêxê nêr ji bo kêrê ye.

-Seriyek e di wê rê de,

Melayê Cizirî jî di helbesteke xwe de wiha dibêje:

"Di rîya durr û miradê, me serî daniye rê".

Yanî, di rîya wê durr ê bêbuha û wê meqsed û mirazê de, min serê xwe daniye rê, bila fedayê wê daw û dozê be, bi qurbana wê cejn û Newrozê be.

Seydayê Cegerxwîn jî, di rêzika helbesteke xwe de wiha dibêje:

"Ji bona herkesî yarek heye, yê min welat yar e".

Min jî li ser vê rêzika seyda, vê rêzîkê zêde kiriye:

"Ji bil wê yar û dildarek me nîn e, ev tenê par e".

Belê xwendevanên delal û hêja; "Seriyek e di wê rê de".

Roşinbîran debê be rolî xoyan rabin

Mehabad Kurdî

(SORANÎ)

Herwek hemûman dezanîn her komelgayek le çend çîn û twêjêk pêk dê. Bê guman komelgay Kurdewarîşman le çend çînî ciya ciya pêk hatiwe, bo nimûne: Cotiyaran, kirêkaran, roşinbîran û hî dîkeş. Helbete her yekê lem çînanê core erkêkî taybetî û pîrozyan dekewête ser şan ke debê, be her şeweyek bê, encamî biden. Cêbecê kirdinî erik û firmanekan be nişaney dilsozî û dirûstî eman dejmêrdêrê.

Çînî roşinbîran be yekê lew çînanê dadenrêt ke pîrozîrîn kar û kirdewey dekewête esto. Le katêkişî bar û doxî nalebarî Kurdistan bêni-ne berçawman, ewa meseleke

giringtir û qûltir debêtewe. Leber ewey niştîmanî ême, Kurdistan, dûçarî çepeltîrîn û pîstîrîn corî dagîrkarî hatiwe, ke nimûney ew le çî şwênî dikey çî-handa nabînrêt.

Le her şorişêkî rizgarîxwazî û neteweyîda, roşinbîran "Nûseran, şairan, hunermendan..." bûnête fidakarî nêw sengerî here pêşewey rûberûbunewey dujminan û dagîrkeran. Nimûne gelêkî heme corman be destewey ke serî mirovyan pê bilind

debêtewe û fêmkayî dexene dil û derûnî azadîxwazanî Kurdistan û hemû cihan. Lam wabê giştman nawî deyan û sedanî ew kelemêrane û roşinbîre rasteqînaneman bîstîwe û pêwîst bewe nakat lêreda nawyan berîn.

Le şorişî azadîxwazane û hawçerxaney emroy Kurdistanîşmanda gelê nimûney be cerg û wireberz û dilêraney roşinbîranî dilgermî Kurdman dête ber



çawan. Her kesê rojê le rojan birî le azadî wilatekey kirdbêtewe, debê nawî şehîd gelêkî wek Mezlûm û Kemal û Xeyrî û sedan û hezaranî dikey bîstîbê, ke çirke be çirkey jiyanyan terxan kirdbû bo xizmet kirdinî dozî reway gelekeyan. Ewane hemûyan tacî zêrênî fexr û şanazî ser se-

ri Kurdanin û estêre geşey roşinkereyewey berbeyanî asmanî temawî û xemawî Kurdistanin!

Kesanêkî aweha nwêkerewey jiyani milleti Kurdin û rê nişanderî rêgay azadî gel û niştîmanin! Ger be hîmmed û hewlî xoragiraney ewan nebwaye, emro ademîzadî Kurd be pot şikaw û ser lê şewaw û nefam demayewe û reşî le sipî ciya nedekirdewe! Meger teniya Amed û girtûxane benawbengekey, bitwanin em core kesaye tiyanê naş biken û

têyan bigen! Roşinbîr dibê yekemin û diwa giyanfiday naw sengerî şerêf û azadî wilatekey bê... Roşinbîr debê çawî lemle lewlay nebê, belku xoy dest pêşxer bê... Laser roşinbîran pêwîste rastî û teniya rastî bîparêzin û nahezan û xofiroşan û gelfiroşan le reg û rîşewe derbikêşin û rîşwayayan bike... Nûkî xamey roşinbîran debê bibête

tîrî têçeqîwî dilî xiyanetkaran û kolonyalistanî Kurdistan! Roşinbîran debê hezaranî wek Mûsa Enteryan lê derbiçê, egerîş na debê rêçke û rêbazî ew bigirne ber û be xwênî tikawî cerg û mêlakiyan, dar çinarekey ew aw biden!

Ey roşinbîranî rasteqîne û be abroy Kurdistan!

Ba xamekantan wişey azadî û

rizgarî û serbexoyiyan lê le dayik bê!

Ba xamekantan wire û aram û oqre bibexşin be gelî kolnerdê Kurdî cêmax le serdem!

Ba xamekantan hest û hîwa û awatî serkewtin le dilî rolekanî Kurda biçênin!

Ba xamekantan bibne meşxeli rêgay rizgarî Kurd û Kurdistan!

Bangek ji bo welat

Î. Xort

Rewşa ku îro gelê Kurd di nav de ye, rewşeke pîr zehmet e û rehet e. Zehmet e. Ji ber ku ji her çar aliyan ve êrîşên neyar ku li çî (tu) dinê tune ye û bi her awayî, bi ser gelê Kurd ve tên. Bi konevaniya xwe ya kevnare, bi çanda xwe ya împeryalist û bi artêşên xwe yê hov û xwînxwar. Reht e; û xwedî pêşengeke hemdemî ye.

Em giş dizanin ku bingeha hebûna gelêkî (milletêkî), zîmanê wî gelî ye. Zîmanê Kurdî vê rastiyê xweş nişanî me dide. Hezar sal e ku Kurd û Kurdistan ji bo her dewleteke kedxwar û zilmar bûye qada cengê û her nîrxên Kurd li ber piyan çûye. Lê hebûna xwe qet wînda nekiriye. Û di binê darê zorê de jî, hebûna xwe xurt kiriye. Ev xurtbûna wî gelî, ji çanda wî ya bi bingeh û kûrtiya dîrokê tê.

Lê mixabin, îro ev bingeh

diheje. Kurd çiqas li Kurdbûna xwe xwedî derdikevin, jî lê li zîmanê xwe jî ewqas xwedî dernakevin. Ev kêmasiyeke pîr mezin e. Du Kurd têne cem hevûdu dest bi Tirkî dikin, yê ku nizanibe hîn zêdetir e, lê belê mirov kare li metropolan hebekî xweş bibîne! Lê ji bo Kurdistanê tu xweş dîtin di vê rewşê de divê tune be.

Îro ger li welatekî ku hejmarê wan nêzî bîst milyona be, 67 hezar rojnameyeke hefteyî (Welat) û 2.5-3 hezar kovarek mehî (Rewşen) bê firotin vê malkambaxbûnê nikare veşêrê û li gorî min du berpirsiyarên vê malkambaxbûnê hene. Yek jê xwendevanên Kurd in û yek jê jî, jinên Kurd in. Xwendevanên Kurd, ji ber ku bi Tirkî xwendine, pirsên Kurdî bi Tirkî mijûl dibin û tînin zimên û çî fêda wan li zîmanê Kurdî nabe. A duduyan: Jinên Kurd, di her dema dîrokê de bûye

stûna hebûna gelê Kurd. Îro ev stûna gelê Kurd jî, dest bi peyvandina Tirkî kiriye. Pîraniya jinên Kurd ku li bajaran in. Me dev ji derve berda. Li mala xwe jî, bi zarokên xwe re bi Tirkî dipeyivin. Malkambaxiya me ji mal dest pê dikel...

Ji bo ku em vê malkambaxiya xwe bidin rawestî (sekinandin) divê em ji mala xwe dest bi peyvandina Kurdî bikin, qet nebe bila Kurdîtiya me di mala me de ji me re bimîne, em Tirkbûna xwe li derveyî mala xwe di hundirê sola xwe bixin, kengê ku em ji malê derketin bila em dîsa bibine Tirkî!

Divê jinên Kurd vê pêşkêşiyê bikin. Mirovên Kurd bi hevûdu re bi Kurdî bipeyivin, rewşenbîrên Kurd, bi Kurdî mijûl bibin û pirsên xwe bi Kurdî bînin zimên.

Banga me ji bo welat ev e ku, kampanyayekê ji bo vê wateyê veke.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Şervan û serleşkerê Kurd. Di 28'ê Adara 1986 an de, li Gabarê şehîd ket. Akademiyek leşkerî li Bekaayê bi navê wî ava bû. Di wêne de tê dîtin/ Pîrek li serê xwe dipêçin, şalpe 2-Xizmetkar, li ber derî bi kar û barên xwediyê kar an jî, malê mijûl dibe/ Cih, war, derî/ Filozofek ji Romaya qedîm 4-Cihê ku çûk lê datînin, hêlin/ Ev roj/ Li Swîsre navê çemek mezin 5-Tê serê peyvan û wateya herî pîr dide peyvê/ Sembola Amerîkûmê/ Kar û barên ku ji bo nasandina berhemek an metayek têne kirin 6-Vexwarinan an germ an jî sar digire 7-Navekî mîran/ Qey 8-Cejn/ Navê xelateke navneteweyî ku di warên edebiyat, zanyarî, aşitî û hwd. de tê dayîn 9-Pergalek muzîkê, yê bi lêdan/ Navekî jinan 10-Dinya wî ali

Serejêr: 1-Dad/ Di felesefeyê de raman 2-Midûr 3-Beşek ji çav/ Di Misra qedîm de, yezdanek/ Notayek 4-Li Tirkîyê sendikaya rojnamevanan/ Piştî duayê tê gotin 5-Zanyariya peyvan 6-Berxên ku nû dikevin 2 saliya xwe/ Yên ku hemal hildigirî 7-Kêrika goşt jêkirinê (çekê Qirix-Doğan Güzel, Gündem)/ Peywirdarê olî, imam 8-Bi Erebi 'ez'/ Resenî, bi nav û dengî 9-Xwarina kûçikan 10-Tiştên herî baş, mengî 11-Navekî ji-

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1					■							■
2										■		
3												■
4				■								
5			■									
6												
7	■											
8												
9												
10	■											



nan 12-Sembola Îridiûmê/ Çinavka kesane yê yekemin û pîrhejmar.
BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ
Çeperast: 1-Qadî Mihemed 2-Edebi/ İvan 3-Daxuyani/ Car 4-Enedol/ Nivîs 5-Zibende/ Ol 6-ETA/ İdia 7-Erk 8-Em/ Lorî 9-Newal/ Si 10-Namidar
Serejêr: 1-Qedexê/ En 2-Adan/ Temen 3-Dexezar/ Wa 4-İbudî/ Klam 5-Miyobî/ Olî 6-Aledar 7-Hîn/ Ni/ İsa 8-Evindar/ İr 9-Ma/ Ve 10-Encî 11-Aso 12-Ar

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16

Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Serpêhatiya dîk û pîrê

Hebû, tunebû, rehme li dê û bavê min û we bû, ji bilî peşkoş û cerdevanan. Li gundekî Kurdistanê, pîrek hebû, ji bo mehîra xwe dan kelandibû, li ser sifriya qirşikî, li ber deqa rojê raxistibû. Dema ku dan hişk bibe wê têxe curu (hewd) û bikute, kapikê jê derxe û êvarê ji xwe re bike mehîr. Êw jî li ber siya diwar rûniştibû, şûjin di destê de bû, kurtanê kera xwe pine dikir. Dîk jî li hewşê diçêriya, wexta ku çav li dan ket dilê wî bijiya dan û çû hinek jê xwar. Pîrê rabû ji bo hinek dan, çavê dîk derxist. Dîk zahf hêrs bû û bi nava gund ket û çû. Rastî (laqî) pisîkekê bû. Pisîkê got: "Kekê dîk.." Dîk got: "Jahr" Pisîkê got: "Ma ez bêjim çî?" Dîk got: "Bêje (dîk dîko kiras spîko, derpî li gûzekê, tuyê biçî ku?)" Pisîkê gote: "Dîk dîko, kiras

spîko, derpî li gûzekê, tê biçî ku?". Dîk got: "Ezê biçim bicivînim koma giran, da ez bibime ser pîra dudiran ku çavê min derxistî ji bo hinek dan. Pisîkê got: "Ma ez bi te re werim?" Dîk got: "Were". Çûn, rastî dûpişkekê bûn. Dûpişk (dorpî) got: "Apê dîk". Got: "Jahr". Lê ez bêjim çî?" Bêje: "Dîk dîko, kiras spîko, derpî li gûzekê, tê biçî ku? Dûpişk got "Dîk dîko, kiras spîko, derpî li gûzekê tuyê biçî ku?" Got: "Emê biçin ku bicivînin koma giran, da em bibine ser pîra dudiran, çavê min rijand ji bo hinek dan." Got: "Ma ez jî bi were werim?" Got: "Were" Çûn, laqî marekî bûn, mar got: "Cîranê dîk". Dîk got: "Quzulqurt" Mar got: "Ma ez bêjim çî? Dîk" Bêje, dîk dîko kiras spîko, derpî li gûzekê, tê biçî ku? Got: "Dîk dîko,

kiras spîko, derpî li gûzekê, tê biçî ku? "Got: "Em diçin ku em bicivînin koma giran, da em bibine ser pîra dudiran, çavê min rijandî ji bo hinek dan." Çûn, rastî kerê bûn. Kerê got: "Seydayê dîk." Dîk got: "Jahr". Eynî gotin dubare bûn û biryara xwe dan ku bi ser pîrê ve herin.

Leşkerên giran, bangorek (gundorek) bi xwe re anîn û hatin ser serê pîra xedarî dudiran ku çavê dîk derxistibû ji bo hinek dan. Ji êvar de dîk firiya çû ser darê, dûpişk kete şekala wê, mar xwe li stûna nava malê gerand, pisîk kete tifikê, ker li ber devê derî rawestî û bangor danîne ser deriyê hewşê. Bi vî awayî tedbîra xwe standin.

Nivê şevê dîk li ser darê kire qîre qîr û bang da. Pîrê got, qey bûye



sibe. Rabû ku nimêj bike. Piye xwe xiste şekalê, dûpişk pê veda. Rabû ser piya, serê wê gêj bû, destê xwe da stûnê, mar pê veda. Dîk ku di tifikê de ronayî di çirisîne, çû ku agir geş bike, ka çî li serê wê qewimiye, destê xwe da çavên pisîkê. Pisîkê xwe retand ser dest û ruyê wê, dest û ruyê wê dirand. Rabû çû ku derke-

ve hewşê, li ber derî, kerê pihînek li qorika wê da, piştta wê şikand. Pîrê rabû ku derkeve nava gund da bike hewar û gazî, bangor bi serde ket û pîra xedar pelixand. Û tola çavê dîk jê hilanîn.

I.Omerî

Têbinî: Ev çîrok, ji bo di Welat de bê weşandî, ji alî Musa Anter ve hatibû birêkirin.

Rûviyê derewîn û xapînok û dîkilê jîr

Digotin carek rûviyek hebû, rojekê gelêk birçî bû... Ji dîr ve dengê dîkilî hate wî ku bang dida. Rûviyê fêlbaz jî gote xwe:

Ezê fêlekê (hîleyekê) li dîkilî bikim ku di gel min bête çolê...

Rûvî çû gund û gote dîkilî

Rûvî: Dîkilo, were ez dê tiştekî girîng ji te re bêjim.

Dîkil: Baş e, lê bi mercekekê (şert) ku tu min nexwî!


Rûvî: Baş e!

Digele rûvî çû çolê, rûvî dîkil bire ber siha darê û xwe havête dîkilî... Dîkil zû xwe havête ser darê û got:

Dîkil: Min zanî ku tuyê min bixapînî û bixwî.

Rûvî: Ez dê çawan te bixwim? Ma te nebihîstîye ku şêrî gotiye. "Dirinde (heywan) hemû divê bibine heval!"

Dîkil: Na, min guh lê nebûye!



Hingê sê-çar se hatin, rûvî jî revî ... û dîkilî got.

Dîkil: Ma te ne got ku dirinde (heywan) heval in. Lê te çima xwe veşart?

Rûvî: Belkî wan îi wekî te guh lê nebûne.

Rûvî bazda, se ew girtin û

kuştin û dîkilî got:

Dîkil: Ew kesê ku dafik di bin hevalê xwe de deyne, ew bi xwe dikeve dafika xwe.

Dûmahî, dîkil çû gund û ji rûviyê derewîn rizgar bû...

Beşîr Botanî

Aştiya me xwîn divêt

Ser şopa Musa Enter
Sojê didîn her û ner
Yan Serxebûn, yan neman
Zaro bi kevr û xencer.

Ser şopa vî xweşmêrî
Pelevanî û dilêrî
Yan Serxebûn, yan neman
Zaro bûye wek şêrî.

Ser şopa geştîrîn pêt
Dê rizgar bitin welêt
Yan Serxwebûn, yan neman
Aştiya me xwîn divêt.

Didîn: Didin
Soj: Soz (Farisi)
Divêt: Dixwaze

Beşîr Botanî

Em stranek ji programa
Bexçeyê Zarokan
Radyoya "Dengê
Serxwebûnê - Swêd
pêşkeşî şehîdê nemir
Musa Enter dikin.

Eşîrên Agirî diçin serdana

Komara Mehabadê

Belgeyên dîrokî



Komara Kurd a Mehabadê, ku di sala 1946' an de li rojhilata Kurdistanê ava bûbû, ji alî Kurdan ve, bi hêvî û bextewariyeke mezin hatibû hambêzkerin. Hemû Kurdên li ser rûyê erdê, Mehabadê weke pêşeroja xwe didîtin.

Qadî Mihemed û hevalên wî ji bo parastina Mehabadê, di hewldaneke mezin de bûn. Lê, kolonyalistên ku Kurdistanê bi çar beşan, li hev par kiribûn, rê li ber bang û hawara alîkarîxwestina wan girtin. Di gelê yekê, ji hemû parçeyan bi hezaran welatparêzên

Kurd, tevî hemû astengî û rêlbergiritinan, bi hêz û hewldaneke mezin xwe gihandin Komara Kurd a Mehabadê

Di nav wan welatparêzên ku alîkarî gihandin Mehabadê de, gelek eşîrên Kurd ên di nav rojhilatê Kurdistanê û bakurê Kurdistanê de dijîyan jî, hebûn. Eşîra Sakayan ku li çiyayê Agirî bi cih û war bûbûn jî, di nav wan eşîran de bû.

Ev fotografên ku di dema serdana Serokê Eşîra Sakayan û Delegeyê Mehabadê Şêx Hesên (Hesên

Kotan) û nûnerên eşîrê de hatine kişandin, cara yekemîn di rojnameya me de, têne çapkirin. Fotograf di dema ku eşîr dikevin Mehabadê de hatine kişandin. Li ser rê, leşkerên parêzgerên bajêr û xwendekarên dibistanên Kurd ku hatine pêşiya eşîran, xuya dibin.

Li gor agahiyên ku Şêx Hesên daye lêzîmên (eqreba) xwe, demeke dirêj li Mehabadê maye û alîkariya rêvebirên Komara Kurd a Mehabadê kiriye. Piştî hilweşîna Mehabadê jî, vegeriya bakurê Kurdistanê.

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ